Danerê Rojnameya pêşî ya Kurdî Miqdad Mîthed Bedirxan

Armanc

Hejmar, No: 145

Çileya Pêşîn
December1993

Buha - Price
15 SKR, 3DM

Rojnameya Mehane

Li Kurdistana Başûr xetereke din

Şerê Navxwe

Ku di navbera Kurdan bi xwe de yekîtî tunebe, leşkerên herî giran û çekên herî modern jî bên û Kurdan ji Seddam biparêzin, dîsa jî ewlehî li Kurdistanê bi cih nabe.

Li gor nûçeyên ku ji Kurdistana Iraqê ketin destê me, di orta meha Çileyê Pêşîn de şer di navbera hêzên Kurdan de derketiye. Li herêma Suleymaniyê, Hewlêrê, Ranya Qaladizê, Helepçê, Kifrî û Kalarê şerekî dijwar di navbera pêşmergên Yekîtiya Nîştîmanî Kurdistanê û Tevgera Îslamiya Kurdistana Iraqê de ku Serokê wê Molla Osman Abdulazîz e, derketiye. Li herêma Suleymaniyê jî şerekî din di navbera PDK-Yekgirtin û Partiya Sosyalîst a Kurdistanê de ku serokê wê Hemê Hecî Mahmûd e, derketiye.

Li gor beyana Hukûmeta Herêma Kurdistanê, pêşmergên Partiya Sosyalist di 10'ê Çileya Pêşîn de êrîş biriye ser Lîweya 22 yan ya herêma Sileymaniyê, dest danîne ser hin çek, cebilxane û çend peşmerge jî dîl girtine. Li ser vê bûyerê Hukûmeta Herêma Kurdistanê pêwîst dibîne ku bersîva vê destdirêjiyê bide.

Li gor nûçeyeke din merivên Hemê Hecî Mahmûd li dijî cîgirê Mesûd Barzanî Samî Abdurrahman jî sûkastek kiriye. Di suîkastê de şofor û 5 parazgerên Samî Abdurrahman birîndar bûn.

Di netîca şerê di navbera pêşmergên PDK û Partiya Sosyalîst a Kurdistanê de, hemû pêşmergên Partiya Sosyalîst teslîm dibin û buroyên wan tê girtin.

Di van şeran de bi dehan kes hatin kuştin û bi sedan kes jî

Dûmahîk r.11

Mesûd Barzanî:

"Em ê rê nedin ku hukûmeta me bê hilweşandin"



Mesûd Barzanî

Rojnama El-Hayat li ser pirs û pirsegirêkên Kurdistana Iraqê bi Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Yekgirtin berêz Mesûd Barzanî re hevpeyvinek çêkir. Pirsên ku li ser şerê di navbera hêzên Kurdan de di vê hevpeyvînê hebûn, em bi kurtî li jêr çap dikin.

Pirs: Çima PDK vî karî ji hikûmeta herêma Kurdistanê re nahêle, ku ew li dijî destdirêjîyên Hizba Sosyalîst raweste?

Bersiv: Hizba sosyalist tuneye û xwe fesih kiribû. Du endamên wê, çûbûne nav YNK'ê. Û pişti Kongra 11-an ya PDKÎ, hemû serkirdayetîya wê hat nav PDKÎ yê. Lê belê hinek niha wî navî dîsa bi kar tînin. Û ev yek, li dijî wê yasaya hizban e ya ku Parlamentoya Kurdistanê derxistîye. Ya din, van mirovan gunehkariyeke pir mezin kirîye, ku êriş birin ser lîwayeka hêzên Pêşmerge û çek û cebilxane birine.

PDK, bi mana nivê hikûmetê û nîvê Parlemanê ye. Her çend ku PDK di hilbijartinê da piranîya dengan stendibû jî bi YNK re nîve niv kir. Me ji partîya hevalbend YNK daxwaz kir, ku ew jî bi pêwistîyên xwe raweste û berevaniya hikumetê bike. Lê belê wê, xwe ji pêwistîyên xwe dûr kir û reviya. Jiber hindê hêza PDK rabû, da wan kirdaren ku bi alikariya derve ve, ev destdirêjî kirine, terbiye bikin. Em hîç destûr nadin kesên ku li dijî yasayê kar bikin û êrîş bibin ser bingehên hukûmetê. Û berqiyek ji Serokê Wezîran yek jî ji Wezîrê Pêşmergan çûne Sileymaniyê û emir dane hêzên leşkerî, da wan çepelan perwerde bikin. Ku nuha ev herdu wezîr jî bi ser YNK ve ne. Qumandarê leşkerî yê herêma Sileymaniyê ku girêdayi PDK ye, emir ji Serokê Wezîran û Wezîrê pêşmergan girtiye, da ku berpirsiyara leşkerî bi cih bîne.

Pirs: Evên derve kî ne ku tu wan gunehbar dikî?

Bersîv: Bi eşkeratî têkiliyên Mihemed Hecî Mahmûd digel Îran û Iraqê hene. Wî hêvî da ku digel Tirkiyê jî têkiliyan deyne. Îcar ev tiştên ku wî li Sileymaniyê kirin, bi alîkariya Îran û Iraqê çêbûne. Ev girêdayê muxaberata herdu dewletan e jî. Û ji bo zêdekirina gelş û nexweşiyan hertim kar dike.

Partiya me serbilind e ku berevaniya demokrasiyê û yasayê kiriye û ji wan kiryarên ku kirine jî ne poşman e.

Li gor 500 mezinên Tirk

"Pirsa Kurd" çawa çareser dibe?

Li gor %64'ê wan çare "riyên eskerî û reform", %20'ê wan "referandum" û %16 "bi tenê riyên eskerî" ye.

Li Tirkiyê kovara **Nokta** her sal bi navê "Yên li Kopê" bi dengê xwendevanên xwe hilbijartinekê çêdike. Di vê hilbijartinê de, ji gelek warî (siyaset, zanistî, akademîsyen, spor, kar, nivîskar, rojnamevan û hwd) kesên jêhatî yên salê tên hilbijartin. Di "merasima diyarîdana 1993'an" de, wek salên berê ji wezîr, parlamenter, akademîsyen, zengînên Tirkiyê 500 kesên elît hatibûn gazî kirin. Mirov dikare bêje birek mezin ji kesên ku Tirkiyê îdare dikin, di merasimê de amadebûn.

Nokta di merasimê de di nav van 500 mêvanên xwe yên hilbijartî de anketek çêkir. Di anketê de li ser hin pirsên rojane pirs hebûn. Di nav van pirsan de "pirsa Kurd" çawa bê çareserkirin jî hebû. Ji 500 mêvanan 458'-an li ser sê alternatîfên bersîvê, dîtinên xwe weha diyar kirine.

a- Dema ji aliyekê ve çareserkirina eskerî bê kirin, ji aliyê din ve çareserkirinên sivîl ku huviyeta Kurdî nasdike divê bên pêk anîn. **% 64 gotiye** "erê" **ji bo vê alternatîfe.**

b- Divê di vî warî de li seranserê welat referandumek bê pêkanîn. Ji bo vê alternatîfê % 20 gotiye erê.

c- Divê bes çareserkirinên eskerî bên meşandin. **Ji bo vê alternatîfê jî % 16 gotiye** "erê".

Dema mirov bersiva kesên elît yên Tirkiyê mêze dike, tiştê ku herî bala mirov dikşîne ew e ku ji şeşa yekê wan çavsor û xwînxwar in. Ji sisiya duduyê wan ne ji bona Kurd azad bin, lê bes ji bo Kurdistan ji destê wan neçe an jî li dinyayê nekevin rewşeke xerab ji bo berjewendiyên xwe dibêjin, em di aliyekê ve mafparêzên Kurdan ji qadê rakin, li aliyê din de jî bi naskirina huviyeta wan çavên wan û yên dunyayê bigrin. Bes sedî 20'ê wan dibêjin "em awakî demokratîk referandum" çêkin. Lê di vê alternatîfê de jî hîle heye; di referandumê de ne tenê Kurd li ser qedera xwe deng bidin, Tirk jî wê bi dengê xwe qedera me tesbît bikin!

Di bersivê de alternatîfeke ku bila Kurd bi xwe referandumê çêkin ka ew çewa dixwazin bijîn, hebûna, gelo wê çend kes jê re bigotana erê?! Bi ya me ne sedî yek jî. Dema rewşa elîtên Tirkan weha be, gelo rewşa xelkê basît ku ji aliyê vê elîtê ve tê motîve kirin wê çawa be? □

Sala we ya nû pîroz be!

Sera şima ya newa pîroz bo!

Salî niwêtan pîroz bêt!

Armanc

www.ARCHIVE.org

Rojeva Mehê

Saleke bêsûd

Piştî wan her sê salên nodî ku bi bûyerên xwe, bûn perçeyeke girîng ya tarîxa gelê Kurd, sala 1993'an ji alî bûyer û guherandinên tarîxî ve bêdeng derbas bû. Ji ber di her sê salên pêşî yên nodî de gelek bûyer çêbûn û struktura civakî ya kevin derizî, perçeyên wê ji cî derketin. Ji sala 1993'an jî, mîna salên rabirdû bûyer û guhertinên mezin dihat payîn.

Xuya ye ku sala 1993'an wê di navbera salên bûyerên girîng yên nodî de mîna saleke bînvedanê bê bîr anîn.

Dema mirov li pişt xwe vedigere û li sala çûyî mêze dike, tabloyeke ne qenc ya Kurdan dibîne. Di muhesebeya sala 1993'an de, Kurd ne bi qezenc in; yên wendakirî ne.

Kurdan xesareta mezin ya salê li Kurdistana Bakur dan. Têkoşîna neteweyî li vî perçeyê welatê me her berdewam e, lê Kurd di gelek eniyan de têk çûn, mewzî wenda kirin. Heger mirov rêz bike;

1- Tirkan di qada dîplomasiya navneteweyî de, di rêya serkevtinê de mewziyên girîng bi dest xistin. Bi dewletên Rojava yên ku di polîtîka dinyayê de xwedî qerar in dan qebûlkirin ku "PKK terorîst" e. Awirên dewletên Rojava yên li ser PKK'ê, siya xwe dixîne ser têkoşîna neteweyî û demokratîk a gelê Kurd giştî jî.

2- Bi teror û şîdetê avayiya demografîk a Kurdistanê ber bi guherandineke li gor stratejiya Tirkan diçe. Bi sedan gund li ser xerîteyê nema tên dîtin, bi hezaran gund nîvvala bûn. Dewleta Tirk bi êrîşên xwe yên li ser bajaran, qezayên wek Farqîn, Pasûr, Gever, Patnos, Nisêbîn, Licê ku kelên Kurdperweriyê bûn, vala bûn û guherîn. Farqînê ji Farqîntiya xwe, Nisêbînê ji Nisêbîntîya xwe gelek tişt wenda kirin.

> **Ji bo ku li Kurdistana Tirkiye ew bayên ku ewrên tarî tînin ser asîmanên welatê me, rawestin, ewrên heyî belav bibin, tîrêjên rojê hîn zelaltir bibin, divê ku di polîtîka û taktîkên serdest yên tevgera Kurdî de guherandinên mezin bibin. Da ku em li benda rabûneke pîştî têkçûyinekê nemînin. Ne xwe buhayê wê bi kêmanî 10 sal e. Û di van 10 salan de jî wê Kurd û Kurdayetî gelek tiştan wunda bike.**

3- Di nav gel de pişgirên têkoşîna neteweyî berbi kêmbûnê diçe. Tevgera neteweyî mîna salên 90, 91, 92'an nikare meş û tevgerên wek girtina dikanan û hwd bi firehî û bi qerardariya salên berê pêk bîne. Di salên çûyî de, gel bi dilxwazî dikanên xwe digirtin, dimeşiyan, lê îsal digel tehdîdan jî nakevin hereketê.

4- Şerê çekdarî ji ber rewşa dinyayê û coxrafya Kurdistanê nikare mewziyên nuh bi dest bixe. Ev ji berê ve astengiyeke têkoşîna neteweyî ya gelê Kurd e. Şerê çekdarî dema dighîje qonaxekê, ji wir pê ve heger paş ve neçe, pêş ve naçe. Gava demeke dirêj di ciyê xwe de disekine, her dewleta merkezî jê qezenc dike. Rewşa îro ya Kurdistana Bakur ev e.

Sala 1993'an li Kurdistana Başûr jî guhertinên mezin bi xwe re neanî. Di gel bê îmkaniyan û êrîş û provakasyonên dewletên kolonyalîst, parastina avahiya Kurdistana Federe ji bo gelê Kurd qezencek e. Di vê salê de Kurdistana Federe ber bi dewletbûnê ve bêtir form girt; ya girîngtir refleksên dewletbûnê di mêjî û tevgeran de, hîn bêtir şekil girt, dûrbûna ji jiyana Iraqê di her warî de hîn bêtir kûr bû.

Bi hêviyên berdewamî û şekilgirtineke ebedî ya Kurdistana Federe em sala 1994'an himbêz dikin.

Ji bo ku li Kurdistana Tirkiye ew bayên ku ewrên tarî tînin ser asîmanên welatê me, rawestin, ewrên heyî belav bibin, tîrêjên rojê hîn zelaltir bibin, divê ku di polîtîka û taktîkên serdest yên tevgera Kurdî de guherandinên mezin bibin. Da ku em li benda rabûneke pîştî têkçûyinekê nemînin. Ne xwe buhayê wê bi kêmanî 10 sal e. Û di van 10 salan de jî wê Kurd û Kurdayetî gelek tiştan wunda bike.

Armanc
Rojnama Kurdî ya mehane/Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon: M. Elî, Hesen Mizgîn, Mîrza Bextiyar, Lewend Firat, S. Rêving, M. Lewendî, **Redaktorê berpirsyar:** M. Elî,
Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Malmîsanij,
Berpirsiyarê rûpelên edebî: Ehmed Huseynî
Utges av: Kurdiska Demokratiska Arbetarunionen
Abonetî/Prenumeration: Abonetiya Salekê, Li Skandinaviya: 200 SKR, Maqam/Myndigheter: 400 SKR, Li Ewrûpa: 50 DM. Li derveyî Ewrûpa: 40 $,
Anons/ilan: nîv rûpel/en halvsidan 2500 SKR
Telefon: 46-8-803135 **Fax:** 46-8-801825 **Postgiro:**50 37 99-9
Adres: Box: 152 16
161 15 Bromma/Sweden
ISSN: 0348 7385

Numûneya îbretê

Akîko Yamada

Di hejmara 136 a Armancê de hevalê me Zinarê Xamo bi keçeke Japonî AKÎKO YAMADA re roportajek kiribû. Akîko keçeke Japonî ye. Ew li Şamê zimanê Erebî dixwîne. Pişti salekê têkiliyên wê bi xwendevanên Kurd re çêdibin. Bi riya wan diçe Kurdistana Sûriyê û li wir dest bi fêrbûna zimanê Kurdî dike. Paşê diçe Parîsê, Enstîtuya Kurdî û li wir dersên zimanê Kurdî digre. Piştî hingê vedigere Kurdistana Sûriyê û diçe Kurdistana Tirkiyê ji bona ku Kurdiya xwe bi pêş bixe. Li ser hev 10 mehan dema xwe dide fêrbûna zimanê Kurdî.

Akîko di 25.11.1992'an de li Stokholmê bû mêvana Armancê. Me wê rojê hev nas kir. Ew bû aboneya Armancê û piştî ku vegeriya Tokyoyê jî her danûstandinên me berdewam bûn. Akîkoyê ta nuha çend name û kartên pîrozbahiyê ji Armancê re şandine. Ew hem bi elfabeya Latînî, hem bi elfabeya Erebî dikare bi Kurdî bixwîne û binivîse.



Fotokopiya nameya Akîko

Ji bo Kurdên ku xîret nakin zimanê xwe fêr bibin, fêrbûna zinamê xwe wek barekî pir giran dibînin, bi zarokên xwe re bi zimanên biyaniyan dipeyivin, em fotokopiya nameyeke dosta Armancê keçika Japonî AKÎKO YAMADA çap dikin.

Tekstîla herî kevn li Kurdistanê hat dîtin

Arkeologan di lêkolînên xwe de potikên herî kevin li bajarek kevnare yê berî tarîxê li Kurdistana Bakur bi dest xistin.

Ev perçê tekstîlê 9000 sal kevin e û bi destan hatiye çêkirin. Ev potik (caw) hewqas sal di nav kirêçê (kalk) de hatiye parastin.

Li gor lêkolînên heta nuha mirovatî 8000 sal berê dest bi cila û lixwekirinê kiribû, lê nuha derket rastê ku 9000 sal e ku mirovayetî dest bi tekstîl çêkirin û cil lixwekirinê kiriye.

Qalindiya her tayekî vê tekstîlê 0,5 mîlîmetre ye û texmîna tê kirin ew e ku ev ta ji qumaşê keten çêbûye.

Li ciyê lêkolînê hinek tene (dan, tov) jî dîtine û wê ev tene bi scannîngelektromîkroskopê bên tehlîlkirin ka çi tene ne. Û herweha di vê lêkolînê de hinek tiştên kevin ku ji bo mîmariya xaniya hatine bikaranîn û tiştên dinê jî hatine dîtin. Li vî bajarê berî tarîxê der û dora 500 mirovan bi karê gund û nêçîrvaniyê mijûlbûne û hinek delîlên ku van merivan li malê jî heywan xwedî kirine, hatine dîtin.

Min ev nûçe ji kovara Swêdî ILLUSTRERAD VETENSKAP hejmara Çileyê paşîn ya 1993'an wergirtiye.

Leyla Aydin



Foto: Ev perçe tekstîl 9000 sal di tebaqa kilsê de hatiye parastin.

ÎLAN

PROTESTO

Dijminê har û hov li dijî gelê me li her çar perçê Kurdistanê şerekî dijwar didomîne. Li Kurdistana Îranê û Tirkiyê roj tuneye ku gund û bajarên Kurdistanê nebin armancên top û bombeyên dijmin. Di van êrîşan de her roj bi dehan hemwelatiyên me têne kuştin, birîndar kirin. Li welatê me mafê jiyanê nehiştine.

Herçiqas Li Kurdistana Iraqê û Suriyê şer tunebe jî tehdît û xeteriya dijmin her roj tê hîs kirin. Her çar dewletên kolonyalîst ji bo Kurdistana Federe bifetisînin li benda keysa xwe ne û her roj provakasyonên nuh li dar dixin. Li Kurdistana Suriyê gelê Kurd ji hemû mafên xwe yên netewî bê par e. Bi sedhezaran Kurd bê nasname dijîn yanî li welatê xwe "ecnebî" (biyanî) ne.

Hovîtiya rejîma Tirk hewqas bê perwa bûye ku êdî hew tehamulê maska xwe ya "demokratîk" dike. Parlamenterên Kurd li kuçan tên kuştin. Piştî HEP'ê nuha ji bo girtina DEP'ê dawe vekirine. Çapemeniya Kurd jî ji terora dewletê para xwe digre; nivîskar, muxabîr, xebatkar û buroyên Ozgur Gundem, Medya Guneşî, Azadî û hwd armancên polîs û hêzên dewletê yên sereke ne.

Em bi navê **Kongra Duyemîn a Yekîtiya Jinên Kurdistanê li Swêdê** polîtîka û êrîşên her çar dewletên kolonyalîst ku li Kurdistanê dimeşînin bi nefretek mezin protesto dikin.

Yekîtiya Jinên Kurdistanê li Swêdê

ÎLAN

Rastkirin

Li ser hejmara Çiriya Paşîn/November 1993 bi çewtî "No: **142**" hatibû nivîsîn, diviyabû No: **144** bûya.

Armanc

Li gor Freedom House:

Kolonîbûna Kurdistanê, Tirkiye, Iraq, Sûriye û Îranê dike kole

Ji 245 welatan dinyayê, Suriye, Îran û Iraq wek welatên herî ne azad, Tirkiye jî ji ber polîtîka xwe a li hember Kurdan wek nîv-azad tê dîtin.

Bi navê Freedom House (Mala Azadiyê) rêxistineke mafên mirovan bi navê "Xerîta Azadiyê" li gor krîterên mafên mirovî û mafên siyasî rewşa 245 welatên dinyayê radixe ber çavan. Paytexta Freedom House li New York'ê ye û wek kar jî li seranserê dinyayê çavdêriya hemû rûdanên di warê mafên mirovî de, dike.

Lêkolîna wan a dawî gelek balkêş bû; her çar welatên ku Kurdistan di navbera xwe de parve kirine him li gor mafên mirovî û him jî li gor mafên siyasî di sinifê de mane. Suriye, Îran û Iraq dikevin kategoriya welatên ku di dinyayê de herî ne azad yanî kole. Tirkiye jî di nav kategoriya welatên nîv-azad de hatiye nîşandan. Ji aliyê mafên mirovî û mafên siyasî ve li dû Bengladeş, Moxalîstan, Macarîstan, Şîlî, Nîkaragua, Senegal, Gambiya, Namibya, Zambiya, Botswana tê. Motîvasyona ku li ser ciyê Tirkiyê ev e: "Mafên siyasî lê heye, lê belê ji ber ku li hember xelkekî din siyaseteke li ser esasê şîdetê û dîskrîmanasyonê daye ber xwe, ji ber tesîra hêzên derve yan yên eskerî di warê siyasî de demokrasiyeke temsîlî pêk tê".

Li gor Freedom House ji bona ku Tirkiye ciyê xwe di navbera welatên ku sinifa yekemîn de tê nîşandayin, bigre, divê di serî de ji bo xelkê di kêmaniyê de ne mafên "self determination" (xweîdarekirin) nas bike û tesîra hêza eskerî li ser platformên sivîl bê rakirin.

Bêşik motîvasyon û şîrovekirina Freedom House ya di derheqa Tirkiyê de rast e. Zincîr û qeyda ku di dest û piyê Tirkiyê de ye, pirsa Kurd e. Çaresernekirina pirsa Kurd li Tirkiye, Tirka kole dihêle. Bêşik, di nav ew sedemên ku Îran, Iraq û Suriyê ne azad dike, çaresernekirina pirsa Kurd roleke sereke dilîze.

Terora Dewletê ya ku li ser DEP'ê dom dike

Dixwazin DEP'ê bigrin



Serokatiya Hatip Dicle di nav DEP'ê de û di nav raya welatparêzan de bêhuzrî peyda kir.

Di meha Çileya Pêşîn de sawciyê sereke yê Yargitayê di derheqê DEP'ê(Partiya Demokrasiyê)de ji bona ku "li dijî prensîba ku dewlet, milet ji welat nayê perçekirinê, faaliyet kiriye" dawe vekir. Ji bo vê jî îddîanameyeke 50 rûpelî hatiye amade kirin. Li gor vê îddîanameyê wek sedema girtinê, axaftinên Yaşar Kaya ku li gelek ciyî kiriye û belavoka Komîta Rêvebir a Merkezî ya DEP'ê ku bi sernivîsa "Banga Aştiyê ya DEP'ê" hatibû belavkirin, hatiye nîşandayîn.

Heger Mahkema Qanûna Esasî di prosesa dawa girtina DEP'ê de lêz bike û beriya hilbijartina 27'ê Adarê biryara girtina partiyê bide, wê demê DEP nikare di hilbijartinan de beşdar bibe.

Dewletê ji bo pirsa Kurdî ji sala 1990'î vir ve 5 partiyên siyasî girtine; Partiya Yekbûyî ya Komunîstên Tirkiye, Partiya Ked a Gelêrî, Partiya Azadî û Demokrasiyê, Partiya Sosyalîst a Tirkiyê û Partiya Sosyalîst e. Li gel DEP'ê dîsa ji ber pirsa Kurdî dewletê di derheqê Partiya Yekîtiya Sosyalîst de jî ji bo girtinê dawe vekiriye.

Êrîşên dewletê yên li ser DEP'ê bi vê dawa girtinê jî nemaye. Nuha jî bi riya Komîsyona Tevlîhev ya parlamentoyê dixwazin masuniyeta (dokunulmazlik) parlamenterên Partiya Demokrasiyê rakin. Di qonaxa pêşî de dixwazin masuniyeta Hatîp Dîcle, Ahmet Turk, Leyla Zana, Mahmut Alinak, Sirri Sakik û Orhan Dogan rakin.

Ji alî wext ve sedemê mezin ya harbûna êrîşên dewletê ew e ku bi çi riyê dibe bila bibe, nehêle DEP bi xurtî beşdarî hilbijartinan bibe. Tehdîd û terora li ser endam û alîgirên DEP'ê jî zêdetir dibe. Ji ber tirsa terora dewletê DEP û ji ber tirsa terora PKK'ê jî partiyên din gelek dijwarî dikşînin ku kandîdatên xwe diyar bikin.

Di kongra DEP'ê de ji 44 kesên ku ji bo Meclîsa Partîyê hatin hilbijartin, ji bo cîgirê serok; Remzî Kartal, Bahattîn Gunel, Kemal Bilget, Osman Özçelîk hatin hilbijartin. Murat Bozlak jî bû Sekreterê Giştî yê partiyê. Wek tê zanîn Hatîp Dîcle di kongra meha çûyî de piştî tûra sisiyan ji bo serokatiya DEP'ê hatibû hilbijartin. Li gor raya siyasetmedarên Kurd, serokatiya Hatîp Dîcle wê DEP'ê qels bike. Ew hêviya ku DEP bibe partiya hemû Kurdên welatparêz her çiqas diçe melûl dibe. □

JI ARMANCÊ

Spas ji bo qertên pîrozbahiyê

Hin xwendevanên me û dezgeyên Kurdî bi munasebeta pîrozkirina sala me ya nuh ji me re qert û name rê kirine. Hin ji van dezgeh û kesan ev in: Ji Fransayê **Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, YEKBÛN** (Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistan) **Komîta Yunanîstanê,** ji Tirkiyê kovara **Medya Guneşî,** ji Almanyayê **HEVKAR,** ji Japonyayê **Akîko Yamada,** ji Îngilîstanê **Omer Kesen,** ji Swêdê **Daîra Biyaniya ya Belediya Stockholmê** (Stockholm Invandrar Förvaltning), **Zeynel, Leyla Aydin,** ji Bulgarîstanê **Azad Cizîrî,** ji Sûriyê **Deham Bavê Binefşê,**

Em spasî van dezgeh û hevalan dikin.

NEYNIK

Em û Dijmin

Hesen Mizgîn

Do Şirnex bûbû hedefa ordîya Romê, îro jî Licê. Dîrokê xwînxwarîya ordîya Romê carek din îsbat kir. Dîya min - rehma xwedê lê be- ji min re tim digot; *"Kurê min bextê Romê tuneye"*, bêbextîya wan bi dûzkirina Licê carek din hate holê. Licê şewitandin. Xelkê Licê cîh û warê xwe terk kir, ket rîya penaberîyê. Lê dinya weke ku kerr û kor be tu deng jê derneket. Ji aliyekî sansûra ordîya Romê û ji alîyekî jî sansûra PKK'ê rewşa gelê Kurd xiste nav tarîtîyê.

Sansûra ordîya Romê meriv dikare fêm bike. Ew dijmin e, kirinên xwe yên hov û xwînxwarîya xwe dixwaze ji bîr û raya giştî veşêre. Dijmin e, mirov tu caran hêvîya xwe jê nake. Ew her tim di xefka xwe de ye û ji bo ku barbarîya wî dernekeve holê çi ji dest tê dike. Bi ya min di wî warî de dijmin gelek serketî ye. Dijmin di her warî de ji xwe re rê vekirîye. Dîplomasîya xwe "xweş" bi kar tîne. Dijmin rê ji me Kurda re gav bi gav teng dike, tevgera me ya bi heq li hember bîr û raya giştî qirêj dike. Gelo li dij van kirinên dijmin em çi dikin?

Îro ji herdemî zêdetir hewcedarîya me Kurda bi çapemenîyê heye. Ya ku rewşa gelê Kurd ji bîr û raya giştî re îzah bike rojnamevan û rojname ne. Xelqê ji bo ku hovîtî û xwînrêjîya dijminê xwe derxe holê berê xwe dide rojname û rojnamevanan, lê em bera wan didin daku dijmin bi avakî hêsantir kirinên xwe bidomîne. Li Kurdistanê sansûra çapemenîyê ne li gor mesleheta gelê Kurd e. Ne ji xwe ordîya Rom jî vaxwaze rojnamên Tirkîyê bûyerên li Kurdistanê binivsînin. Heqê tu kesî tuneye ku rojnamevan ji welatê me dûr bixe yan jî wan sansûr bike. Sansûr kirina rojnamevanan divê ne karê me be. Dema em vî karî bikin, em kirinên dijmin jî heya cîhekî qebûl dikin. Rewş çawa dibe bila bibe, dijmin çi metodî bi kar tîne bila bi kar bîne nabe ku em kirinên PKK'ê bi heq bibînin.

Em hêjî di pey afirandina dijminên xeyalî de ne. Di vî warî de bi rastî jî em gelekî "jêhatî" ne. Di gotarên me de dewletên wek Almanya, Fransa, Brîtanya û DYA wek dijmin tên nîşan kirin. Tu dibêjî qêy dijminên me yên heyî ne besî me ne, em li dijminên nû digerin. Dijminên me - Tirkîye, Sûrîye, Îran û Iraq- li dij pîlanên "dijminên me yên xeyalî" bi hevre civînan dikin, dixwazin peymanan îmze bikin; rê û îmkanan peyda bikin ku hêzên NY ji herêmê dûr bixin. Zimanê min nagere ku bêjim, lê di cîyekî de em û dijmin digihîjin cîyekî muşterek û ev yek ji bo me rûreşî ye; em ne layiqî vê rûreşîyê ne.

Di bikaranîna îmkan û fersendên demokratîk de jî em Kurd gelek caran şaşîtîyên wisa dikin ku tevgera Kurdî ji dêlva ku pêşde here, paşde diçe. HEP û DEP ji bo vê yekê nimûneyên bêhempa ne. Ne HEP û ne jî DEP ji ber hevgirêdana xwe ya bi rêxistina îllegal di vatiniya xwe de bi ser neketin. Di afirandin û bi rêvebirina sîyasetek "Kurdî" de bersîva hêvîya ku ji wan dihate kirin, nedan, nikarin bidin jî. Ji ber ku di kar û barê xwe de ne azad in, hevsar di destê rêxistina nehênî de ye. Ji ber vê yekê ye ku mebûsên DEP`ê di hevpeyvîn û sohbetên xwe de newêrin a di dilê xwe de bibêjin. Ji ber ku ne rehet in nikarin sîyasetê jî bikin; mêjîyê wan tiştekî difikire zimanê wan tiştekî din dibêje. Ji ber ku ne ji bo mesleheta netewî lê ji bo ya şexsî û grûbî hatine vê meqemê, çavê wan girtî ye zimanê wan badayî ye. Helbet ev yek jî bi kêrî dijmin tê.

Min du sohbetên mebûsên DEP`ê -Ahmet Turk û Orhan Dogan- guhdarî kirin. Tu yekî ji wan newêribûn kuştina zarok, jin û îxtîyaran -sebeb çi dibe bila bibe, kî dike bila bike- mehkûm bikin.

Em di avakirina partîyeke legal de zorê didin hevûdu ku bi hevre partîyekê ava bikin. Herçiqas em pê dizanin ku PKK û PSKT ne xwedî toleransê ne û ji mesleheta grûbî fedekariyê nakin, dîsa jî em zorê didin xwe û bi hevîyên vala xwe dixapînin, wext wenda dikin û ev jî kêrî dijminê me tê.

Bi ya min divê her dîtinên sîyasî di warê demokratîk de xwedî însîyatîf be. Bila tirsa PKK`ê nebe sebeba pasîfîzmê. Divê em bikaribin ji bo gelê xwe alternatîfan dîyar bikin. Pasîfîzma me çiqas dom bike, tevlîhevî jî wê hewqas zêdetir be. Di vî warî de herçiqas bi derengî ketibe jî biryara YEKBÛN'ê ya li ser xebata avakirina partîyeke legal pozîtîf e.

19.11.1993

www.

RAMANÊN RAMANWERAN

Konferansa zimên qonaxeke nû ye

Hemîd KILIÇASLAN

Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û Beşê Kurdî ya Enstîtuya Neteweyî ya ziman û Medenenîyeta Rojhilatê ya Unîwersîteya Sorbonê di 28-29´ê meha 11´an de bi navê "Zimanê Kurdî Berbi Sala 2000 î" li Parisê, li Unîwersîteya Sorbonê li Anfiya Liardê konferanseke navneteweyî pêk anî, Ev bûyera pîroz wek nûçe belav bû; çê-neçê li ser hate nivîsandin, lê hin aliyên balkêş yên vê konferansê neketin ber qelemê. Destnivîs û belgeyên Konferansa Navneteweyî ya "Zimanê Kurdî Berbi Sala 2000 î" nehatin belavkirin. Ez bawer im Enstîtuya Kurdî ya Parisê dê wan bi awayekî belav bike.

Ez wek endamê xebata KURMANCÎ beşdarî konferansê bûm. Konferansa Neteweyî ya li ser "Zimanê Kurdî Berbi Sala 2000 î" bi konferansger û babeta xwe ve ez bawer im yekem konferans bû. Bi gotineke din ev cara yekem bû ku konferansek bi wî rengî dihate damezirandin.

Amphîtheatre Lîard ya Unîversîteya Sorbonê ji bo 200 guhdarî dergehên xwe vekiribû. Pesnê anfiyeke wek Liardê bawer nakim ku bi qelemê bête dan. Xweşikbûn û taybetmendiya wê tenê konferans di sîdanê de nedihişt...

Ji ber nebûna belgeyan û ji nezanbûna zimên (Fransî û Îngilîzî) ez dê bi têne hin tiştên ku ez pêre gihîştim û min ji devê wergêran girtin, pêşkêşî xwendevanan bikim. Axaftinên konferansgêran di cîh de bi du zimanan dihate wergerandin. Mirov karîbû bi radyoyên bi guhuk li ser sê pêlan -Kurdî, Fransî, Înglîzî- guhdar bikira.

Di herdu rojên konferansê de digel axaftin û pêşniyaran, tiştekî gelek balkêş ku ji konferansgêran teva zêdetir çepik jê re hatin li hevketin, hejayî dîtinê bû.

Generalekî Fransî Pierre Rondot ku di salên 1930`an de di Komisaria Bilind ya Fransayê li Bêrûde, xwedî desthilat bû, du rojan di nav vexwendiya de runiştî bû. Gava navê wi hate anonskirin û rabu pîya, bala civatê bi carekê ket ser wi:

Mirovekî sere, li dor 90 salî xuya dikir. Li gor temenê xwe, gelekî zînde bû û gava bi bejna xwe yi nezi du metroyan meşîya, mirov tê derdixist ku Rondot bi xwe jî bi kesera salen buhurî, lê li ser xwe, zinde li dora xwe temaşe dikir. Kî dizane, belki dixwest hin hempayen xwe bibîne, belki jî tiştin din bi bîr dianî...

Gava Generalê Fransî hilkişîya ciyê xeberdanê û dest bi axaftinê kir û xeberdana wi hate wergerandin, herkes li cîhê xwe mat ma û guhdar kir.

"Ez hevalê Sureyya, Celadet û Kamuran Bedirxan im û bi hevaltiya wan gelekî serbilind im. Ez di Komîsarîya Bilind ya Fransayê li Bêrûdê bûm. Mîr Kamûran di navbera Hereka Kurdî û Komisarîya Fransayê de diçû û dihat, têkilî datanî.

Celadet Beg wê gavê li Şamê bû û Mîr Kamuran, ew wek înformatorê xwe bi kar dianî. Wê demê fikra kovara "HAWAR"ê bi wan re çebûbû. HAWAR gerek bi Kurdî, Erebi û Fransî derbiketa. Ji bo subwansiyeneke çapemenî ser li komîseriya Fransayê dan, lê Ereb, Çeçan û Durzî li dijî çapemenîyeke bi Kurdi derketin û ji ber vê jî komîseriyê daxwaza wan ya ji bo alîkariya çapkirina "HAWAR"ê qebûl nekir"

Pîerre Rondot her ku xeber dida, bala guhdaran bêtir diket ser axaftinên wî:

"Li Cizîrê (bakurê Sûrî ji Eyndîwerê heta çiyayê Kurda) mirov nikarîbû karê entelektuelî bikira, wê demê kesên ku li Cizîrê problem derbixista gerek Fransa ew teslîmî Tirkî bikirana. Lê çûn û hatin zêde bû. Hin kes ji hêla Nisebînê û jora wê, gava li welêt bênderên xwe hiltanîn, dihatin Bêrûde kar dikirin û carna jî qaçaxî dikirin. Lê tim vedigerîyan gundên xwe. Tekiliyên Mîr Kamûran û Celadet Beg bi wan re gelekî xweş bûn.

Min alîkariya Mîr Kamuran û mala Bedirxan kir. Bi navê mustear di kovarên wan de nivîsen min çap bûn*. Carna ji bo serrastkirina Fransî alîkarî ji min dixwestin. Lê bawer bikin, di nivîsandina Fransî de gelek zîrek bûn. Ji xwe hergav dixwestin tişta bê qusûr bikin û binivîsinin.

Mixabin Celadet Ali Bedirxan û Roger Lescot gelekî bêwext koça xwe bar kirîn.

Ez li pêş we hurmeta xwe ji wan re nîşan didim. Spasiyen xwe ji Enstituya Kurdi û mala Bedirxan re pêşkêş dikim."

Gotinên Rondot tesîreke mezin li herkesî kir. Ji çepikkutanê mezintir xelat tune bû. Demeke dirêj herkesî, lî ser piyan destên xwe ji bo kalê hêja li hev xistin.

Ez bi tu awayî naxwazim gotinên camêr şirove bikim, lê ez dikarim bibêjim; careke din diyar bû ku hêjayên wek Mîr Kamuran û Celadet Begê gorbîhişt serbîlindayiya me bûn....

Hin alîyên konferansê yên ne li gor dilê mirov jî helbet hebûn. Gava mîrov zanayên xwe yên Kurd ku çend stêrk li ser milên wan jî, ne xem e , dide ber yên din, dilê mirov bi halê mirov dişewite. Carinan di nav sohbetan de min digot; "Mirovê ku deh salan teneka bitewîne, dikare bibe hostayê soba." Lê hin ji zanayên me yên ku min di vê konferansê de dîtin, ger ev çend sal in jî teneka ditewînin, hê negihîştine çêkirina lûleyan.

Yek ji wan tiştên ku ne li gor dilê mirov, guhnedana katê ku ji bo her konferansgêrekî hatibû veqetandin, bû. Konferanseke bi vî rengî ku hema hema hertişt tê de programkirî be, nîv seet heqê mîrov be û mîrov seet û nîvekê xeber bide, program serûbinê hev dibe. Yên zana divê mafê yên din têk nebe.

Yan jî ger mirov di konferanseke wiha de belengazî û bextreşiyê derxe pêşîya zanînê, gelo wê alem bi çi çavî li stêrkên milên mirov temaşe bikin.

Helbet di nav guhdaran de jî yeklibên xav peyda dibûn, yan gotin berevajî digirtin yan jî bi mûçinkê tiştên ji wan re dibûn ji nav peyvan dikşandin û pê arvanê xwe li êş dikirin. Tew camêrekî pirseke xwe kir û protestoya xwe vê re... Lê mixabin li benda bersivê jî nema, derket û çû.



Generalê Fransî, hevalê Celadet û Kamûran Bedirxan Pierre Rondot. (Foto: Lutfî Baksî)

- Çima hûn li ser Lor û Zaza û Feyliyan xeber nadin..?

Lê pişti derketina camêr, zimanzanên biyanî careke din bersiva pirsê dan.

Herçend mînakên çê û yên ne çê dirêj bibin jî encamên Konferansa Netewî ya li ser "Zimanê Kurdî ber bi sala 2000 î " gelek hêja û balkêş bû.

Hate pêşniyarkirin ku ev konferans divê bibe destpêka konferansên werengî. Eger îmkan hebe, salê carekê konferanseke weha lidarkeve. Yan na her du salan carekê pêwîst e ku konferansek pêk were.

Hate pêşnîyarkirin ku sala bê, konferanseke weha li Başûrê Kurdistanê li Dewleta Kurda ya Federe li dar keve.

Wezîrê Perwerde yê Başûrê Kurdistanê dîyar kir ku; konferansê gelek ronahî daye wî. Li Kurdistanê, li Dewleta Kurda ya Federe di prosesa perwerdekirinê ya nû de dê encamên konferansê bidin ber çavên xwe.

Di destpêka konferansê de hate dîyarkirin ku "konferans dê tu biryaran negire", lê pirs û pirsgirêkan raberî raya giştî bike, pêşnîyar û çareserkirin ji bo pêşerojê be.

Azadîya zaravayên zimanê Kurdî gelek giring hate dîtin. Herweha bi qanûnan rê li ber zaravayan girtin, xelet hate dîtin. Çi Kurmancên jor çi yên jêr, Zaza, Feylî û herweha eger xwe Kurd qebûl dikin Lorî, Bextyarî...ûwd.

Pêşnîyar û gotubêja li ser Kurdî bi tîpê Latînî di destpêka konferansê de li tahtê rast hat, lê ber bi dawîya konferansê erda wê nermtir bû. Ji Başûrê Kurdistanê wezîrê perwerde û serokê Korî Zanyarî li ser vê pêşnîyarê piştgirîya xwe dîyar kirin. Li Kurdistanê ji bo pêşnîyarkirin û pêkanîna vê daxwazê soz dan.

Konferans li ser yekgirtin û pêşketina zimanê Kurdî bi dirêjayî rawestîya û gihişte netîceya ku "pêşketina zimên bi azadîya gel ve girêdayî ye. Eger statuya sîyasî ya Kurdan tunebe û biryarên bingehîn neyên wergirtin, ziman jî

Dûmahîk r. 11

Stiriyên me

Zinarê Xamo

Te ji min re got "tu qaz î!"

Heger şaş di bîra min de nemabe wê di çîrokeke *Azîz Nesîn* de be, du heval bi hev re rûniştine ji xwe re dipeyivin. Yek bala xwe dide derve, dibêje *"wa ye dunya ewr e"*. Yê din dibêje *"te ji min re got tu qaz î"*. Mêrik dibêje: *"Xwedê hevza meriv ji te bike law, ma kînga min ji te re got tu qaz î? Min got dunya ewr e. De îcar di navbeyna 'ewr' û 'qazê' de çi têkilî heye Xwedê jê razî ?"*

Yê din dibêje heye, çawa tuneye. *"Çaxa dunya ewr be mana xwe ew e ku wê baran bibare. Çaxa baran bibare wê av di kort û golan de kom bibe. Û çaxa av di kort û golan de kom bibe, wê qaz herin têkevin avê, ajnê bikin. Ev jî tê wê manê ku te ji min re got " tu qaz î "*.

Helbet merivên wiha jîr tenê di dunya edebî de dernakevin hember meriv, ew ne tenê qehremanên çîrokên **Azîz Nesîn** in, di jiyana rojane de jî gelek caran meriv rastî kesên wiha jîr û fehman tê, li hember baqilî û zîrekiya wan şorik ji devê meriv dihere, meriv ji xwe re mit û mat dimîne.

Em bibêjin li ser berhema wî, tu bîr û baweriya xwe dibêjî, li gor têgihîştin û zanîna xwe, tu wê rexne dikî.

Wê rabe bibêje:

–Ev meriv ji xwe ji berê de dijminê min e. Çimkî kalikê min carê di domîneyê de berra kirîbê kalikê wî dabû. Ji wê rojê de ye ku ew wê kînê bi xwe re digerîne. Nuha bi vê rexneyê ew heyfa kirîbê kalikê xwe ji min digre; lema jî vê şahesera min bêqîmet nîşan dide.

Tu dibêjî bira! Bi serê min û te haya min ji lîstika kirîbê kalikê min û kalikê te tuneye, tu pir kûr diherî. Min îro ev berhema te neeciband, lema rexne kir, lê gava yeka din biecibînim ezê pesnê wê bidim. Lê qet li te guhdarî nake, her dibêje *"te ji min re gotiye tu qaz î"*.

Tu, nivîseke wî, fikir û argumentên wî yên li ser wê mesela konkret çewt dibînî û di wî warî de fikrên xwe dibêjî. Wê rabin secera wî û malbata wî raxin ber te û ji te re bibêjin:

–Ma ne şerm e ku tu hemû xizmet û fedekarî û xebatên vî camêrî înkar dikî? Ma tu nabînî ku camêr dev ji malê dunyayê berdaye, ruhê xwe weqfî gel kiriye!? Çi heqê te heye tu zimanê xwe dirêjî merivekî wiha dikî?

Tu dibêjî bavo, min ne qala xebatên camêr kiriye û ne jî ew înkar kirine, min li ser nivîseke wî fikra xwe gotiye. Mesele hewqas basît e. Lê dengê te dihere kê? Ew her dibêje *"te ji min re gotiye tu qaz î"*.

Tu, dîtin û siyaseta partiya wî ya li ser meselakê rast nabînî û wê rexne dikî. Wê rabe ji te re bibêje:

–Tu naxwazî Kurd rizgar bibin. Heger te rizgariya Kurdan bixwesta te yê partiyeke ku ji bo gelê xwe xizmetê dike, têkoşînê dide rexne nekira. Piştî ku te rexne kir mana xwe ew e ku tu ne dost î, tu dijmin î. Û kesê dijminê partiyê di eynî wextê de dijminê gel e jî. Çimkî partî ya gel e.

Tu dixwazî pê bidî fahmkirin ku bi rexneyekê meriv nabe merivekî nêtxerab û dijminê gel. Lê carê mohra *"dijminatiyê"* li te xistiye, tu xwe di ava kewserê de jî kî qet pere nake. Tu dibêjî emrê min ji Xwedê û jê bi dûr dikevî.

Tu dibêjî dizî tiştekî ne baş e, divê meriv diziyê neke. Wê bibêjin:

–Tu merivekî hesûd, çavnebar û xêrnexwaz î.

Tu naxwazî ku Kurd jî wek milletên din bi pêş kevin, bibin xwediyên klasîkên mezin. Heger tu ne merivekî zikreş, hesûd û edxem buya te yê sawa îfşabûnê nexista dilê van xizmetkarên millet; bileks te yê jî di wî warî de alîkariya wan bikira...

Tu dibêjî heyran! min negotiye ku bila edebiyateke Kurdan a pêşketî tunebe, bila bi sedan nivîskarên me çênebin...min gotiye em keda xelkê nexwin, jê re hurmetê nîşan bidin. Lê kî guh dide te. Ew her dibêjin *"tu ji nivîskaran re dibêjî hûn qaz in "*.

Heta vira min ji zîrekiya însanên me çend numûneyên ku em aşînayên wan in, dan. Ev numûne jî nîşan didin ku wek civat kêfa me ji mantiqê komployê re tê, em dixwazin her tiştî bi vî mantiqî îzah bikin. Ev xuyekî ne baş e. Ne şert e ku li pê her rexneyî nêteke xerab hebe.

Li ser jîrîya însan tasnîfeke **Machîavellî** heye, kêfa min gelek jê re tê. Dibêje:

–Jîriya însan sê babet e: Kesên ku ji xwe ber fahm dikin; kesên ku tiştên ji wan re tên gotin fahm dikin û kesên ku ne ji xwe ber fahm dikin û ne jî bi riya hinekên din fahm dikin.

Hela ka hûn jî bala xwe bidinê, gelo piraniya yên li dora we dikevin kîjan katagoriyê?

ROJA NOBEL

Mustafa AYDOGAN

Her sal di dehê çileya pêşîn de çavên dinyayê ji bo hedîseyeke mezin dadigerin ser Swêdê. Di vê rojê de, li Swêdê li bajarê Stockholmê hem ji aliyê karrîer û hem jî ji aliyê mezinbûna hecmê pereyên ku tê belavkirin ve, xelatên herî mezin yên dinyayê têne dayin. Dehê Çileya Pêşîn roja Nobel e. Ji ber ku Alfred Nobel di 21-ê Cotmeha 1833-an de li Stockholmê hatibû dinyayê, di 10-ê Çileya Pêşîn a 1896-an de xatir ji jiyanê dixwaze, li dû xwe navekî bilind û serweteke pirr mezin dihêle û di sînga axa sar de ji xwe re li cîhekî germ digere. Her sal li gor wesiyetnameya Alfred Nobel ya ku di 27-ê Mijdara 1895-an de li bajarê Parîsê hatibû nivîsandin, di roja Nobel de, di pênc şaxên cuda de xelat têne belavkirin. Alfred Nobel di wesiyetnameya xwe de xelatbelavker jî tayin kiriye; Xelata Edebiyatê ji aliyê Akademiya Swêdê; Xelata Fizyolojî û Tibê ji aliyê Enstîtuya Karolînayê; Xelata Fîzîk û Kîmyayê ji aliyê Akademiya Zanistê û Xelata Aşitiyê jî ji aliyê Parlamentoya Norweçê ve tê belavkirin. Her muessese ji bo tesbîtkirina xelatwergiran, bi navê Komîteya Nobel, komîteyek damezrandiye. Xelata Aboriyê jî ji sala 1969-an û vir de(di 300 saliya Banka Dewletê ya Swêdê de), ji aliyê Banka Dewletê ya Swêdê, ji bo bîranîna Alfred Nobel tête dayin. Pereyên ji bo vê xelatê, ji kasa Banka Dewletê tê dayin û bi qasî yên ku ji aliyê Weqfa Nobel tê dayin e. Qaîdeyên xelatê yên ji bo her pênc şaxên ku ji terefê Weqfa Nobel fînanse dibin, ji bo dana Xelata Aboriyê jî derbas dibin.

XIZMETA MIROVATIYÊ Û MADDEYÊN WÊRANKIRINÊ

Du aliyên xebatên Alfred Nobel hene. Ger mirov van herdu aliyan bi hevdû re nebîne, mirov dê neheqiyê li vî dahîyê Swêdî bike. Ji ber vê yekê, divê mirov karaktera xebatên wî û berhemên van xebatan bi herdu aliyên li-hevdûnekir ve raxe ber çavan. Qiralê barûtê, kaşîfê madeyên teqandinê Alfred Nobel bi saya fabrîkeyên ku malzemeyên herbê çêdikin, bû şîrketdarê mezin î yekem yê multinatsyonal. Nobel di gelek warên sîvîl de jî -wek lastika sun'î, çermê sun'î, hevirmêşê sun'î, motora gazê, teknîka qeynaxkirina polayê û hwd- ji bo mirovatiyê xizmetên gelek mezin kirine, lê navê wî her bi madeyên teqandinê û yên ji ortêrakirinê ve hatiye girêdan. Barût û Alfred Nobel, dînamît û Alfred Nobel bi hevdû re hatine bilêvkirin. Wî ji dervayî dînamît û jelatîna teqandinê gelek tiştên din jî keşif kirine. Nobel xwediyê patenta 85 keşfên cuda bû û ji bo keşfên pêşerojê gelek riyên nû pêşkêşî kaşifên li dû xwe kir. Li Swêdê, di warê sanayiya kîmyayê de şîrketa herî mezin bi navê Alfred Nobel tê naskirin; "Nobel Industrier Sverige AB". Ev şîrket bi 20 000 karkerên xwe û bi 20 mîlyar Kron cîroya xwe ya salane ve, di seha kîmyayê de hemû şîrketên din li dû xwe hiştiye. Di sala 1984-an de du şîrketên giregir; Bofors AB û KemaNobel AB bûn yek û ev şîrketa herî mezin ava kirin. Bofors AB di sala 1873-an de li bajarê Karlskogayê hatiye damezrandin, lê xwediyê wê yê ji sala 1894-an heta 1896-an yanî heta roja wefatê, Alfred Nobel bi xwe bû. Ev şîrket bi giranî malzemeyên parastinê, bi gotineke din, malzemeyên herbê çêdike; top, sîstema robotan, cepxane û hwd. KemaNobel di 1871-ê de li bajarê Stockholmê hat damezrandin. Di nav malzemeyên ku ji aliyê vê şîrketê tê çêkirin de, di gel hin maddeyên din, maddeyên teqandinê jî cîhekî girîng digrin. Gava fabrîkayên ku piştî keşfên Nobel hatin avakirin, dest bi hilberînê kirin, ji aliyekî ve di warê şerê li hember xwezayê tê meşandin de, ji bo serkevtina mirovatiyê îmkanên muazzam hatin amade kirin, ji aliyê din ve jî ji bo xerakirin û ji ortêrakirina berê xwêdana mirovatiyê, di destên şerxwazan de bû sîleheke wêrankirinê. Xelatkirina berhem û keşfên ku di rêya pêşveçûna mirovatiyê de mîna qonaxên girîng têne naskirin û îmkana wêrankirina di destên şerxwazan de mîna paradoksekê xuya dibe. Mirov xelatkirina xebatên di warê fîzîk û kîmyayê de fahm dike. Ji ber ku Nobel di van şaxan de navê xwe li rûpelên dîrokê kolaye. Lê ya herî balkêş jî ev e ku mirovê mîna qiralê barûtê tê naskirin, ji bo çi dana xelata aşitiyê û ya edebiyatê xistiye wesiyetnameya xwe? Çêkirina topên herbê û xelatkirina xebatên aşitiyê, li ba min pirseke ku hîn bersiva xwe nedîtiye, lê her çi dibe, bila bibe, xelatkirina xebata aşitiyê biryareke pîroz e û ev xelat bi xwe jî, ji bo karê aşitiyê tesîreke mezin dike. Min ji bo întresseya Nobel ya di warê edebiyatê de, rûpelên pirtûkên eleqadar hebekî tev dan. Min dît ku Alfred Nobel hîn di 18 saliya xwe de bi zimanê îngilîzî helbest nivîsandiye. Ji xwe wî bi pênc zimanan(Swêdî, Rûsî, Almanî, Îngilîzî û Fransî) pirr baş dizanîbû. Hinek berhemên wî yên şaxên cuda yên edebiyatê netemamkirî mane. Di nav çend romanên wî yên neqediyayî de, ev herdu roman jî hene; romana wî ya bi navê "Xwişkê" û ya bi navê "Li Afrîkaya Herî Ronî". Lê tev hemû hewildan û xebatên wî yên cuda jî li hember çêkirina barût û dînamîtê dengên protestoyê kêm nebûn. Nivîskarê Swêdê yê herî mezin August Strindberg di helbestekê de êrîşî Alfred Nobel dike. Di wir de îddîa dike ku keşfa Nobel dikare dinyayê di hedîseyeke trajîk de wêran bike (August Strindberg ji ber îdealên xwe û ji ber vê helwestê, ji xelata Nobel ya Edebiyatê ,mahrûm hate hiştin). Li gor hinekan, Nobel bi xwe jî dizanîbû ku dînamît dikare ji bo wêrankirinê bê bikaranîn, lê felsefeyeke wî ya weha hebû; materialên wêrankirinê çiqas zêde bibin, şertê herbê ewqas teng dibe. Mirovatî piştî Alfred Nobel bi felsefeyên weha re rû bi rû bû, lê tu tiştî nikarîbû rê li herdu herbên cîhanê bigirta. Her ku malzemeyên xerakirin û ji ortêrakirinê bêtir bûn, rîska ku dinya ji ortê rabe ewqas zêdetir bû; mirovatiyê xwe ewqas zêdetir di talûkeyê de hîs kir. Di 10-ê Çileya Pêşîn ya 1896-an de, dema Nobel wefat kir, şîrketa navdar ya Almanî **Krupp** patenta raketan wergirt û mirovatiyê di pêvajoya herba cîhanê ya duyem de bi çavên xwe dît ku bê **Bombeyên-V** jiyan çawa didan ber xwe û berhemên keda mirovatiyê çawa hildiweşandin.

Alfred Nobel

XELATÊN NOBEL

Alfred Nobel di 1896-an de wefat kir, lê fikra wî ya di warê xelatan de, ancax di 1901-ê de kete jiyanê. Destûra Weqfa Alfred Nobel di 1900-î de qediya û weqfê di sala 1901-ê de dest bi belavkirina xelatan kir. Di 1897-an de, malhebûna Nobel hat tesbîtkirin: 33,2 milyon Kron. Piştî bicîhanîna daxwazên mirovên wî û dana baca mîrasê- li Swêdê 1.8 milyon Kron, li Fransayê 1,3 milyon Kron- ev tibab hebekî daket. Lê di sala destpêkirina xelatan de, ev tibab mîna 27 716 243 Kron hat diyarkirin. Di 1901-ê de, her xelatwergirekî/xelatwergirekê 150 782 Kron stendin. Lê malhebûna weqfê ya di sala 1993-an de dighêje 2,2 milyar Kronan û ji ber vê yekê, pereyên ku tê belavkirin jî li gor vî meblaxî bilind e; 6,7 milyon Kron. Her xelatwergirekî/xelatwergirekê li gel dîploma û medalyayê xelatê, 6,7 milyon Kron wergirtin. Qaîdeyên xelatê eşkere ne; li gor wesiyetnameyê, divê xelatên hemû şaxan ji aliyê mîqtarên pereyan ve wek hev bin. Di her şaxêkî de, Komîteya Nobel ya bi wî şaxî re eleqadar e, dikare xelatekê bi wekhevî herî pirr ji bo du karan bide, an jî herî pirr di nava sê kesan de par ve bike. Ger di şaxekê de tu kes ji bo xelatwergirtina wê salê nehatibe tesbîtkirin, xelata wê salê neqlî sala dahatû dibe. Ger xelat di sala dahatû de jî neyê dayin, divê di fondê bête razandin. Divê her xelatwergir piştî wergirtina xelatê, di nava şeş mehan de konferanseke resmî bide. Xelatwergir xelatên xwe ji destê qiralê Swêdê li avahiya "Konserthuset" werdigre. Xwarina êvarî li avahiya "Stadshuset li salona "Blå hallen" tê xwarin û li wê derê, di nava programeke dewlemend de, her xelatwergir axaftinekê dike.

XELATWERGIRÊN YEKEM Û YÊN HERÎ TALÎ

Navên xelatwergirên ji 1901-ê heta 1993-an, di nivîseke weha de hilnayê, ji ber vê ez dê bi tenê navê xelatwergirên yekem û yên talî binivîsînim. Di 1901-ê de di warê aşitiyê de xelata yekem, di nava H. Dunant(Swîsre) û F. Passy(Fransa) hat parvekirin. Xelata Aşitiyê ya 1993-an jî di nava du mirovên Afrîkaya Başûr, yekî spî û yekî reşik De Klerk û Nelson Mandela de hat parvekirin. Xelata Fîzyolojî û Tibê ya 1901-ê bû ya E A von Behring(Almanya) û ya 1993-an di nava Richard J Roberts (Brîtanyaya Mezin) û Philip A Sharp(DYA) de hat parvekirin. Xelata Fîzîkê ya 1901-ê para W C Rîntgen(Almanya) ket û ya 1993-an jî di nava du mirovên Amerîkî Russell A Hulse û Joseph H Taylor Jr de hat parvekirin. Di warê kîmyayê de xelatwergirê sala 1901-ê, JH van't Hoff (Hollanda) û ya sala 1993-an di nava Kary B Mulis(DYA) û Michael Smith(Kanada) hat parvekirin. Xelatwergirê yekem(1901) yê edebiyatê ji Fransayê S. Prudhomme û yê 1993-an jî ji Amerîkayê Toni Morrison bû. Xelata Aboriyê ya yekem bû malê R. Frisch(Norweç) û J. Tinbergen(Hollanda). Xelata Aboriyê ya 1993-an jî di nava du mirovên Amerîkî Robert W Fogel û Douglas C North de hat parvekirin.

XELATA EDEBIYATÊ JI DESTPÊKÊ VE BÛYE MIJARÊ MUNAQEŞEYÊ

Xelata ku herî pirr bûye mijarê munaqeşeyê, Xelata Edebiyatê ye. Gava ku xwediyê yekem yê vê xelatê ji aliyê Akademiya Swêdê hat diyarkirin, di civakê de reaksiyoneke mezin peyde bû. Wê gavê 42 nivîskar û hunermendên Swêdê li hember vê biryarê derketin. Di nava wan de, August Strindberg, Selma Lagerlöf, Heidenstam û hwd hebûn. Lev Nikolayeviç Tolstoyê ku di bandeva nivîskariyê de bû, hatibû ji bîr kirin û neh salên din li jiyanê mayin jî, têra xelatwergirtinê nekiribû. Tolstoy di 1910-an de bê xelata edebiyatê çavên xwe li dinyaya gewrik digre. Li gelek deverên dinyayê nivîskar û rojnameyan li ser vê helwesta Akademiya Swêdê nivîsandin û neheqiya li Tolstoy û hinekî din yên hevçaxên wî hatibû kirin, anîn zimên. Emile Zolayê pêşevanê naturalîzmê, ji ber îddîayên ku Nobel ji naturalîzmê nefret dikir û Zola nivîskarekî nebaş didît, ji xelatê mehrûm hate hiştin. Zola piştî belavkirina xelata yekem, ancax salekê li jiyanê ma û di 1902-an de wefat kir. Selma Lagerlöf heta 1909-an li bende xelatê sekinî û ancax di wê salê de bû xwediya xelatê. Di dîroka Xelata Edebiyatê de, heta nuha bi tenê xelatwergirekî xelat qebûl nekiriye; J. Paul Sartre. Sartre xelata 1964-an qebûl nake û sedema qebûlnekirina xelatê weha dide xuyakirin; "Ger giraniya tesîrên derve tev hêza bêjeyan bibe, dê neheqî li xwendevanan bête kirin."

WELATÊ KU HERÎ PIRR XELAT WERGIRTIYE; FRANSA

Fransî welatê xwe navenda edebiyatê dibînin û dana xelata edebiyatê jî mîna mafekî Fransayê dihesibînin. Jixwe, Fransî gelek caran weha dibêjin; Xelata Edebiyatê xelatek ku malê Fransayê ye, lê ji terefê Swêdê tê dayin. Di warê Xelata Edebiyatê de Fransa bi 13 xelatwergiran welatê ku herî pirr xelat wergirtiye; piştî Fransayê, bi 11 kesan Amerîka, bi 9 kesan Brîtanyaya Mezin, bi 6 kesan Almanya û Swêd, bi 5 kesan jî Îtalya tê û hwd.

XELATWERGIRÊN WELATÊN BAKUR

Ji welatên Skandinavyayê (Swêd, Norweç, Danîmarka) li ser hev, 12 kesan û ji yên Bakur (Skandinavya+ Îzlanda û Fînlandiya) jî 14 kesan Xelata edebiyatê wergirtine. Ji Swêdê: 1909: Selma Lagerlöf, 1931: E A Karlfeldt, 1951: P. Lagerkvist, 1966: Nelly Sachs (eslê wê ji Almanyayê bû xelat bi S. Agnonê Îsraîlî re par vekiribû), 1974: Eyvind Johnson û Harry Martinson. Ji Norweçê: 1903: B. Björnson, 1920: K. Hamsun, 1928: S. Undset Ji Danîmarkayê: 1917: K. Gjellerup û H. Pontoppidan, 1944: JV. Jensen Ji Fînladiyayê: 1939: FE. Sillanpää, Ji Îzlandayê: 1955: HK. Laxness

XELATA EDEBIYATÊ YA1993-an

Di van çend salên dawî de li hember biryarên Akademiyê reaksiyonên mezin xuya nebûne. Ev jî dide diyarkirin ku xelatwergirên van salên dawî ji aliyê pirraniyê ve tên tesdîqkirin û êdî Akademî jî girîngiyê bêtir dide lênerînên elîta

Dûmahîk: r.11

Di 1920'î de Xebateke Ebdurrehîm Reh

Mahmûd Lewendî

Di destpêka sedsala bîstan de di nav xebata siyasî ya Kurdan de xebata kulturî jî dest pê kir. Gava ku mirov li kovar û rojnameyên wê demê dinêre (wek: Jîn, Kurdistan, Rojî Kurd, Hetawî Kurd û hwd.) mirov di nav rûpelên wan de kêm be jî vê bareyê dibîne. Her weha xebat û munaqeşeyên li ser ziman jî vê demê dest pê dikin. Mesela kitêba "Hînkirina Zimanê Kurdî" ya Komela Hêvîyê wê wextê derketiye.

Her weha munaqeşeyên li ser alfabe û zimanê Kurdî jî dîsa wê demê dest pê dikin. Xelîl Xeyalî, M. Salih Bedirxan, Ebdurrehîm Rehmî, Muhemmed Mihrî û hîn gelekên din di nav munaqeşe û xebata li ser ziman cih digrin.

Bi qasî tê zanîn wek kitêb heta nuha tenê "Hînkirina Zimanê Kurdî" ya ku ji teref Civata Telebeyên Kurd Hêvîyê di 1921'an de hatîye çapkirin, tê zanîn.(1) Her çendî behsa kitêba Muhemmed Mihrî "Muqeddîmet ul-Îrfan" tê kirin jî lê heta nuha hê derneketiye ronahîyê (2)

Ji xebatên wê wextê yek jî xebata Ebdurrehîm Rehmîyê Hekkarî ye. Ji vê tabloya lêkerên Kurdî tê fêmkirin ku ew gelekî li ser Kurdî xebitîye. Ji xwe di dawîya vê tabloyê de bi Kurmancî daye diyarkirin ku wî "Qewaîda Mezin"a Kurdî" amade kirîye, lê nekaribûye çap bike.

Ev tabloya lêkerên Kurdî di 1986'an de ji Kutupxana Diyarbekirê li gel hejamara 36. a rojnama Jînê(3) hevalekî ji me re şand. Tablo bi herfên Erebî bi Tirkîya Osmanî û Kurdî li ser kexezek zerolankî hatiye çap kirin. Ebada wê 41,5X28,5 cm ye. Di binê tabloyê de *"1 Tîrmeh 1336* (1920), *1 Temmûz 336"* hatiye nivîsîn, li binî jî îmza *Ebdurrehîm Rehmîyê Hekkarî* heye.

Ji ber ku yê ku tablo ji me re şand li gel rojnama Jînê şandibû, li gor gotina wî her dû di nav hevde bûne. Her weha tarîxa tabloyê û ya hejmara 36. a Jînê (21.06.1920) jî çi bigre nêzî hev in. Û dîsa bi qasî ku tê zanîn Ebdurrehîm Rehmî yek ji xebatkarên rojnama Jînê bûye. Ji xwe her di wê hejmara Jînê de nivîs û helbestên wî jî hene. Li ser tabloyê jî bi Tirkî û Kurdî *"Diyarîyek ji bo zaruyê Kurdan - Kurd çocuklarına bir hedîye"* hatiye nivîsîn. Ji ber wê yekê em fikirîn me got dibe ku ev tablo wek diyarîya Jînê bi rojnamê re hatibe belavkirin.

Tablo wekî hûn jî dibînin, tewanga hin lêkerên Kurdî nîşan dide. Û li binî jî bi Tirkîya Osmanî hin îzahatên gramerî hatine kirin. Her weha E. Rehmî li gor gramera Erebî termînolojiyek ji bo demên lêkeran jî nivîsîye.

Çend nimûne jê ev in: **Binke**: masdar, **Fermanî**: Emrî hazir, **Têt**: Mudari', **Pêş**: Îstîqbal, **Wera Bûrî**: Şert fî el-mazî (4), **Wera Têt**: Şert fî el-Mudari'

Li vir me ew tabloya Ebdurrehîm Rehmî ji herfên Erebî wergeran herfên latînî. Bê ku em dest bidinê, em pêşkêşî xwendevanan dikin.

1-Ji bo zêdetir agahdarî binêre; Malmîsanij; Hînkerê Zimanê Kurdî, Çarçira(Kovara Çandeyî ya Giştî), no:2 (Nîsan 1986),Stokholm, r.23

2-binêre: Kemal Badilli; Türkçe İzahlı Kürtçe Gramerî (Kürmançça Lehçesî), Ankara, 1965, r.6 (nota binî)

3-Ji bo rojnama Jînê b.: Malmîsanij -M. Lewendî; Li Kurdistana Bakur û Li Tirkîyê Rojnamegerîya Kurdî (1908-1981), Weşanên Jîna Nû, Uppsala, r: 81

4-Li vir WER di maneya "ger, eger, heke" de hatiye bi kar anîn. Melayê Cizîrî jî di malikeke helbesteke xwe de di vê maneyê de "wer" û carna jî "er" bi kar anîye:

Setweta Leylê yeqîn Mecnûn tepand
Wer ne Qeys nakit beyabanê xelet

Ji Hafiz Qutbê Şîrazî, Mela fehm er bikî razî
Bi awazê ney û sazî bibin ber çerxê perwazî
Melayê Cizîrî

Hejmar 1

DÎYARÎYEK JI BO ZARUYÊ KURDAN — KURD ÇOCUKLARINA BİR HEDİYE

Cedvel 1

masdar				îsmî hazir				fi'lî mudar'i				fi'lî hal				fi'lî îstîqbal				hikayeî mazî					hikayeî hal						hikayeî îstîqbal					
masdar	madde-î asliye	edat-ı masdar	nûn-î masdariyet	harf-i emir	madde-î asliye	hareke		edat-i muzar'i	maddeyî asliye	zamir fiili		edat-i hal	edat-i muzaraat	maddeyî asliye	zamir fiili	edat-i istikbal	harf-i emir	maddeyi asliye	zamir fiili	zamiri şahsî	maddeyî asliye	edat-i masdar	hikayeyî mazi edati		zamiri şahsî	edat-i muzaraat	maddeyi asliye	edat-i masdar	zamir fiili		zamiri şahsî	edati istikbal	maddeyî asliye	edati masdar	hikayeyi istikbal edati	
bezîn	bez	î	n	bi	bez	e	bibeze/koş	di	bez	im	koşarım	wê	di	bez	im	koşuyorum	dê	bi	bez	im	koşacağım	ez	bez	î	bûm	koşduydum	ez	di	bez	î	m	koşuyordum	ez	dê	bez	î	bam	koşacaktım
dan	d	a	n	bi	d	e	bide/ver	di	d	im	veririm	wê	di	d	im	veriyorum	dê	bi	d	im	vereceğim	min	d	a	bû	verdiydim	min	di	d	a	-	veriyordum	min	dê	d	a	ba	verecektim
kirin	ki	r	in	bi	k	e	bike/yap	di	k	im	yaparım	wê	di	k	im	yapıyorum	dê	bi	k	im	yapacağım	min	ki	ri	bû	yapdıydım	min	di	k	ir	-	yapıyordum	min	dê	k	iri	ba	yapacaktım
êxistin	êx	ist	in	bi	êx	e	biêxe/düşür	di	êx	im	düşürürüm	wê	di	êx	im	düşüriyorun	dê	bi	êx	im	düşüreceğim	min	êx	isti	bû	düşürdüydüm	min	di	êx	ist	-	düşüriyordum	min	dê	êx	isti	ba	düşürecektim
şuştin	şu	şt	in	bi	şo	-	bişo/yıka	di	şo	m	yıkarım	wê	di	şo	m	yıkıyorum	dê	bi	şo	m	yıkayacağım	min	şu	şti	bû	yıkadıydım	min	di	şu	şt	-	yıkıyordum	min	dê	şu	şti	ba	yıkıyacaktım
kevtin	kev	t	in	bi	kev	e	bikeve/düş	di	kev	im	düşerim	wê	di	kev	im	düşüyorum	dê	bi	kev	im	düşeceğim	ez	kev	ti	bûm	düşdüydüm	ez	di	kev	t	im	düşüyordum	ez	dê	kev	ti	bam	düşecektim
geryan	ge	ya	n	bi	ger	e	bigere/gez	di	ger	im	gezerim	wê	di	ger	im	geziyorum	dê	bi	ger	im	gezeceğim	ez	ger	ya	bûm	gezdiydim	ez	di	ger	ya	m	geziyordum	ez	dê	ger	ya	bam	gezecektim
bûn	b	û	n	bi	b	e	bibe/ol	di	b	im	olurum	wê	di	b	im	oluyorum	dê	bi	b	im	olacağım	ez	b	û	m	olduydum	ez	di	b	û	m	oluyordum	ez	dê	b	û	bam	olacaktım

fi'lî şert fî el muzar'i						fi'lî şert fî el mazî						mazî şihûdî					mazî neqlî					ismî fa'il					ismî mef'ûl						fi'lî mazî şihûdî			
edati şart	zamiri şahsi	harfi emir	maddeyi asliye	zamir fiili		edati şart	zamiri şahsi	maddeyi asliye	edati masdar	edati hikayeyi istikbal		zamiri şahsi	maddeyi asliye	edati masdar	zamir fiili		zamiri şahsi	maddeyi asliye	edati masdar	hareke		edati failiyet	maddeyi asliye	edat-i masdar	hereke		edati faliyet	fiili meful	maddeyi asliye	cdat-i masdar	nûn-i masdariyet		lazim		mute-'eddî	
eger	ez	bi	bez	im	koşarsam	eger	ez	bez	î	bam	koşsaydım	ez	bez	î	m	koştum	ez	bez	î	m	e	koşmuşum	yê	bez	î	ye	koşan	-	-	-	-	-	-	ez hatim	geldim	min da	verdim
eger	ez	bi	d	im	verirsem	eger	min	d	a	ba	verseydim	min	d	a	-	verdım	min	d	a	-	ye	vermişim	yê	d	a	ye	veren	yê	hat	d	a	n	verilen	tu hatî	geldin	te da	verdin
eger	ez	bi	k	im	yaparsam	eger	min	k	iri	ba	yapsaydım	min	k	ir	-	yaptım	min	k	iri	-	ye	yapmışım	yê	k	iri	ye	yapan	yê	hat	k	ir	in	yapılan	ew hat	geldî	wî da	verdi
eger	ez	bi	êx	im	düşürürsem	eger	min	êx	isti	ba	düşürseydim	min	êx	ist	-	düşürdüm	min	êx	isti	-	ye	düşürmüşüm	yê	êx	isti	ye	düşüren	yê	hat	êx	ist	in	düşürülen	cemî'			
eger	ez	bi	şo	m	yıkarsam	eger	min	şu	şti	ba	yıkasaydım	min	şu	şt	-	yıkadın	min	şu	şti	-	ye	yıkmışım	yê	şu	şti	ye	yıkayan	yê	hat	şu	şt	in	yıkanılan				
eger	ez	bi	kev	im	düşersem	eger	ez	kev	ti	bam	düşseydim	ez	kev	t	im	düştüm	ez	kev	ti	im	e	düştmüşüm	yê	kev	ti	ye	düşen	-	-	-	-	-	-	em hatin	geldik	me da	verdik
eger	ez	bi	ger	im	gezersem	eger	ez	ger	ya	bam	gezseydim	ez	ger	ya	m	gezdim	ez	ger	ya	m	e	gezmişim	yê	ger	ya	ye	gezen	-	-	-	-	-	-	hûn hatîn	geldiniz	we da	verdiniz
eger	ez	bi	b	im	olursam	eger	ez	b	û	bam	olsaydım	ez	b	û	m	oldum	ez	b	û	m	e	olmuşum	yê	b	û	ye	olan	-	-	-	-	-	-	ew hatin	geldîler	wan da	verdiler

mazî neqlî lazim		mazî neqlî mute'eddî		mudari'		fi'l		Türkçesi
ez hatime	gelmişım	min daye	vermişim	ez didim	veririm	ez im	fi'l cewherî	benim
tu hatî	gelmişsin	te daye	vermişsin	tu didî	verirsin			
ew hatiye	gelmiş	wî daye	vermiş	ew dide	verir	ez esker im	" "	ben askerim
cemî'						ez bûm	fi'l hikaye	benîdîm
em hatine	gelmişız	me daye	vermişiz	em didin	veriyoruz			
hûn hatîne	gelmişsiniz	we daye	vermişsiniz	hûn didin	veriyorsunuz	ez esker bûm	" "	ben askeridim
ew hatine	gelmişler	wan daye	vermişler	ew didin	veriyorlar			

izah

1-BINKE=Masdar: Kürtçede iki nev' masdar vardır, zevadden 'ari ise basit, değilse murekkebdir, masdar-ı murekkebe mesadır-i basitenin eveline veyahut ahırine bir takım edatların ilavesiyle hasıl olur. "Xwarin=Yemek" basit, " Vexwarin=İçmek" gibi. Edat-ı masdar mesadır-i basitenin nihayetindeki î, a, r, st, şt, t=d, ya, û edatlarıdır ki bunların sonuna gelen "n" masdarıdır.

2-FERMANÎ= Emr-i hazır: Edat-ı masdar ile "n" (nun) masdariyeti hafz olunarak madde-i asliyenin eveline "b" nihayetine "e" sati getirilerek yapılır. "Bezîn= Koşmak, Bibeze=Koş" gibi.

3-4-TÊT=Mudarı', Nuha=Hal: Madde-i asliyenin eveline meksur "d" nihayetine zamir fiili ilavesiyle mudarı', mudarı'ın eveline "wê" edatının ilavesiyle hal yapılır. "Bezîn=Koşmak, Dibezim=Koşarım, Wê Dibezim=Koşuyorum" gibi.

5-PÊŞ=İstikbal: Emr-i hazırin eveline "dê" nihayetindeki hareke yerine de zamir fiili getirilir "Bibeze=Koş, Dê Bibezim=Koşacağım" gibi.

6-BÛRÎYA DÎTÎ= Mazî şihûdi masdarın nihayetindeki yalnız "n" (nûn) masdariyeti hafz edilerek eveline zamir-i şahsi, nihayetine zamir-i fiilin ilavesiyle yapılır. "Bezîn=Koşmak, Ez Bezîm=Koştum" gibi.

7-BÛRIYA BÎSTÎ (BIHÎSTÎ?) = Mazî neqlî: Mazi şıhudinin nihayetine "e" ilavesiyle hasıl olur, "Ez bezîm = Koştum, Ez bezîme = Koşmuşum" gibi.

8-ÇÎROKÎ=Fi'l-i hikaye: "Bûn" masdarından ibarettir.

9-ÇÎROKÎYA BÛRÎ=Hikaye-i mazi: Mazi-i şıhudiyenin nihayetine fiili hikaye ilavesiyle yapılır, "Ez bezîbûm=Koşmuşidim veya Koşduydum" gibi.

10-ÇÎROKÎYA NUHA = Hikaye hal: Fiili Mudari' de zamir-i fiiliyeden evel edat-ı masdat getirilerek yapılır, "Ez dibezîm = Koşuyordum" gibi.

11-ÇÎROKÎYA PÊŞ = Hikaye-i istikbal: Fiil-i istiqbal ki "b" emırın xedifiyle(?) edat-ı masdar getirilerek zamir-i fiiliyeden evel "ba" ilavesiyle yapılıyor, "Ez dê bibezim = Koşacağım, Ez dê bezîbam = Koşacakidim" gibi.

12-WERA BÛRÎ = Şert fi el mazi: Hikaye-i istikbalin eveline "eger" veyahut "wer" ilavesiyle edat-i istiqbal hazf olunur, "Eger ez bezîbam = Koşsaydım" gibi.

13-WERA TÊT=Şert fi el mudarı': Emr-i hazırin eveline "eger" daha sonra zamir-i şahsinin nihayetine de zamir-i fiilin ilavesiyle yapılır, "Eger ez bibezim=Koşarsam" gibi.

14-NAVÊ KIRÎ = İsm-i fail, Navê kirîya wî: Ism-i meful: N (nûn) masdariyeti hazf edilerek müzekkerlerde "yê", muenneslerde "ya", sonuna da samit ise "ê", sait ise "yê" edatının ilavesiyle ism-i fail, masdar-ı basitelerin eveline muenneslerde "ya hat", muzekkerlerde "yê hat" ilavesiyle ism-i meful yapılır, "yê da = veren, yê hat dan=verilen" gibi.

KAIDE=İsm-i mef'ul ef'al-i mechuleden bina edildiği için lazımlar muteadi edildikten sonra yapılır, "Bezîn; Yê hat bezandin=Koşturulan."

ÎFADE=Birtakım madde-i muvani'den dolayı Kürd lisanının mufessel kavaid kitabını neşr edemediğimden muteessifim. Bir hizmet-i meftuhare olmak üzere hiç olmazsa şu cedvelin mevki-i intişare vazı'i Kürd mılletince bir hizmet-i nacizane olarak kabul buyurulursa minnettarım.

Xemxwar im ji ber çapnekirina qewa'ida mezin. Bi çapkirina vê kaxezê jî fexrê dikim, lewra di nav bê hemiyetîyê da xidmetek tête hesêbê.

Di 1 Tîrmeh 1336 (1920) Fî 1 Temmûz 336
Ji mala Hekkariyan
'Ebdurrehîm Rehmî

Transkrîpsîyona tabloya lêkerên Kurdî ya Ebdurrehîm Rehmî ku di 1920'î de amade kirîye .

www.kurdishacademy.org

Li Ser Zimanê Kurdî

Ebdurrehîm Rehmî

(Abdurahim Zapsu)
(1890-1958)

Ebdurrehîm Rehmî di 1890'î de li hêla Elbakê (Başkale)-qeza Wanê- ji dayik bûye. Navê bavê wî Seyyid Mehemed Pertew e. Navê diya wî Ematullah Xanim e. Ebdurrehîm Rehmî xwendina xwe ya destpêkî û navînî li Wanê temam kirîye. Paşê li Anqerê "Dibistana Karmendiya Malî" xwendîye. Piştre jî li Îstenbolê Fakulta Îlahiyatê temam kirîye. Wî bi Rûsî, Almanî, Kurdî, Tirkî, Erebî û Farisî zanibû.

Ebdurrehîm Rehmî zewicî bû û navê jina wî Hîdayet Ezîz bû. Hîdayet Xanim ji binemala Bedirxanîyan keça Ezîz Bedirxan e. Du kur û du keçên Ebdurrehîm Rehmî hebûn; Jale, Pertew, Hale û Metîn. Ebdurrehîm Rehmî di 9'ê Sibata 1958'an de wefat kiriye.(1)

Ebdurrehîm Rehmî yek ji ronakbîrên Kurdan ê destpêka sedsala me ye. Wî di kovar û rojnama Jînê de gelek nivîsên Kurdî û Tirkî nivîsîne. Herweha gelek berhemên wî wek kitêb bi Tirkî û Kurdî derketine. Kitêbên wî yên bi Kurdî yên ku tên zanîn ev in: Memê Alan (piyesa Kurdî), Eqîda Kurdan (Îlmîhala menzûm a Kurdî), Gazîya Welat (helbest). Ji derveyî van berhemên wî yên Kurdî, wek di dawîya vê cedwela wî ya tewandina lêkerên Kurdî de jî tê fêm kirin ku wî kitêbeke "Qewaîdê" li ser zimanê Kurdî amade kirîye lê nehatîye çapkirin.

Çi di kitêba **Hazım Kılıç** de be û çi jî di pêşgotina **M. Emin Bozarslan** a ji bo çapa nû ya kovara Jînê de be û bi qasî ku em pê dizanin heta nuha tu kesekî behsa nivîsên wî yên di rojnama Jînê de û kitêba wî ya "Qewaîda Mezin" nekiriye.

E. Rehmî li gel jina xwe Hîdayet Ezîz û zarokên xwe Jale, Pertew û Hale, 1930 (Foto: Ji Pirtûka H. Kiliç "Evdirehîm Rehmîyê Hekarî" hatiye girtin

Çavkanî

(1)-Ji bo zêdetir agahdarîyên derheqê jiyan û berhemên Ebdurrehîm Rehmî de binêre:

- **Hazım Kılıç**; Helbestvan û Nivîskarekî Welatparêz Evdirehîm Rehmîyê Hekarî (Abdurrahim Zapsu), Weşanxana Xanî û Bateyî, Bröndby/Danmark, 1991, 130+4 (foto)r.

- JÎN kovara Kurdî, 1918, wergera ji tîpên Erebî bo Latînî M. Emîn Bozarslan



Fotokopiya tabloya lêkerên Kurdî ya ku Ebdurrehîm Rehmî di 1920.'î de amade kiriye.

Welatê min hê jî bi xêr û bêr e

■ **Konê Reş**

Kesên ku dem û cih bi hev ve girêdidin dîrokê ji gelê xwe re datînin, ango dîroka gelê xwe ne, nemaze ew mirovên ku giraniya xwe ya pak û durust di dilê gelê xwe de hîştibin û bi wê pakî û durustiya xwe li welatê xwe nav û deng dabin. Di dîroka gelê Kurd de gelek mirovên ji vî terzî hene. Canê xwe gorî xaka welatê xwe kirine û dûrî welatê xwe mirine. Lê mixabin, ta roja îro kes li wan bi xwedî derneketîye û mafê wan nehatîya dayin, tevî ku demek pir dirêj di wê navê re derbas nebûye û hê jî di bîranînên kalemêran de mane.

Lê di roja îro de kesên ku li yên wek van mirovan bi xwedî derkevin û bidin ser dews û şopa wan, gelo mirov dikare çi navî li wan kesan bike? Di bawerîya min de, kesên ku di roja îro de li wan mirovên kevnar xwedî derkevin lehengên zemanê xwe ne li nav welatê xwe.

***

Wek ku dîyar e pişti serhildana Şêx Seîdê Pîranê di sala 1925'an de û bi şûnde, Binya Xetê û Sûrîye bû cîgehê welatparêz û rewşenbîrên Kurdan. Hingê wan mirovan ji neçarî, ji ber zilm û zorê ji welatê xwe mişextî Sûriyê bibûn û dixwestin hê jî xebat û berxwedanê li dijî dagirkerên Tirkan bikin. Wek pêşengên milletê Kurd di wê heyamê de mirov dikare van bi nav bike:

-Hemzeyê Muksî: berpirsiyarê kovara Jîn (1918).
-Memduh Selîm Begê Wanî: Yek ji xebatkar û berpirsiyarên Jînê û hîmdarê "Xoybûn"ê (1927).
-Mîrê alfabeya Kurdî, nevîyê Mîr Bedirxan, Mîr Celadet Bedirxan û birayê wî Kamûran Bedirxan.
-Qedrî Can: helbastvanê helbesta Kurd ji Dêrika Çîyayê Mazî.
-Kurên Cemîl Paşayê Dîyarbekirî Qedrî Beg û Ekrem Beg.
-Abdurrehmanê Elîyê Ûnis; serokê serhildana Sasonê (1925-1936).
-Haco Axa; serokê Hevêrkan û hîmdarê Xoybûnê (1927).
-Dr. Ahmed Nafiz Beg Zaza; birayê mezin ê Dr. Nûreddîn Zaza û destbirakê Mîr Celadet Bedirxan û bijîşkê kovara Hawarê.
-Dr. Nûrî Dêrsimî, Arif Beg Ebbas, Mele Ehmedê Namî....

***

Ezê vegerim ser lehengên xwe yên ku ez dixwazim qala wan bikim:

Di Gulana 1993'an de du nivîskar û rojnamevanên Kurd ji Ewrûpayê hatin Sûrîyê û li bajarê Qamişlo bûn mêvan. Yek ji wan nivîskar **Mahmûd Lewendî** û yê din rojnamevanê hêja **Mîrze Bextîyar**.

Bê guman min xwest ez wan bibînim û hêvîyên xwe bi kesên wek wan re lêkim, wiha bi şahîyeke mezin ez bi wan re ketim dan û standinê û min xwest ez serwextî dîrok, çand û rojnamevanîya Kurdî bibim, belê min dît ku hêvî û daxwazîyên wan jî hene û yên wan ji yên ku di serê min de ne mezintir in. Hêvîyên wan ew bû ku li wan welatparêz û rewşenbîrên ku me ew li jorê bi nav kirine bigerin û ku herin ser gorrên wan gurzegulan di ber kêlên wan de biçikînin. Hem jî hevpeyivînan



Gundê Dugirê; Wargeha welatperwerên Kurdan (Foto: Armanc)

bi zarok û nevîyên wan re çêkin. Belê li vê tenê jî nesekinîn, xwestin ku helbestvanên Kurd yên klasîk jî bibînin, nemaze ewên ku ji nifşên Cegerxwîn in wek; **Mele Nûrî** (Pirêşan) û **Seydayê Palo** û hwd. Û di nav rojan de jî xwestin ku guhdarîyê li dengbêj û sazbendên Kurdî yên kevnar bikin. Nemaze ewên ku ji bin kurkên Ûsivkê Çelebî û dengbêjên Çiyayê Omerîyan û Çiyayê Şengalê derketine wek; **Husênê Tewfo** û **Hizniyê Selîm**.

Di çûna gundê Dugirê -wargeha goristana welatperwerên Kurdan li Binya Xetê- min hiş û xeyala xwe dida mamoste Mîrze Bextîyar dema ku wêneyê gorra Hemze Begê Muksî dikişand, hingê min dizanî ku Mamoste Mîrze Bextîyar bi kamera xwe re vedigere salên 1918'an dema ku Hemze Beg kovara Jîn derdixist û dema ku wêneyê kêla Haco Axa dikişand hingê min dizanî ku pêre diçe wan salên 1926-27'an dema ku Haco Axa şerê Tirkan dikir. Wiha M. Bextîyar bi wan lehengan re vedigeriya salên xebat û bizava wan ya Kurdayetîyê.

Di şevbêrkekê de jî bi nevîyên **Elîyê Ûnis** re min xeyala xwe dida

Dûmahîk r. 11

Çand û wêje

ARTUR RIMBOUD

DEMSALEK Dİ DOJEHÊ DE

-IV-

Ên sipî ji keştiyê peya dibin. Top ! Gerek em xwe di kirasê **Baptismê** xînin, cil û berg li xwe kirin û kar kirin. Min sirra mehrebaniyê di dil de wergirt. Ax ! Min pêşbîniya wê nedikir. Tu cara min ziyan nekiriye. Dê roj li ser min sivik bin, ezê hewceyî tobê nebim. Dê azarên giyanê min tunebin; giyanê ku hema hema li hemberî çakiyê bêhestdarî ye, ku ronahiya dijwar mîna mûmên darbestane berz dibe. Çarenûsa kurê malbatê; darbestek pir zû bi hêsirne giranbuha nixumandiye. Bê guman ku qehpetî, kerîtî ye, gunehkarî bêhişî ye, pêwîst e em genîtiyê bavêjin alîkî. Lê ew katjimêra dîwêr dê tu carî neşê ku di wê azara zelal de zinge-zingê neke.! Ma gelo ez dê wek zarokekî bêm revandin, daku ez di bihiştê de bilîzim û hemî renckêşanê ji bîr bikim.!

Bi lez! Ma gelo jiyanine dîtir hene? Di dolmendiyê de nayê xewkirin. Herdem saman tiştekî gelemperî bû. Bi tenê evîna Xwedayî kilîtên zanistê dibexşîne. Ji bilî dîmena başiyê di xuristê de nabînim. Bi xatirê we ey xewnino, ey nimûneno û ey şaşîtîno. Sirûda firişteyên hişyar ji keştiya firyadê bilind dibe: Evîna Xwedayî ye. Du evîn!.

Ez dikarim ji ber evîna dinyayî bimirim û dikarim bi xwegorîkirin bimirim. Ez çend giyanan bi dû xwe de dihêlim, dê êşa wan bi koçkirina min xurttir bibe!

Hûn dê min ji nav ên xeniqî hilbijêrin; ewên mayî ma gelo ne hevalên min in?

Wan rizgar bikim!

Awez (aqil) ji min re ji dayik bû. Cîhan xweş e.

Ez dê cîhanê pîroz bikim. Ez dê ji birayên xwe hez bikim. Ev sozine zarokane nîn in, her weha hêviya rizgarbûna ji destê Pîremêrî û mirinê jî nîne. Xwedê sazkarê hêza min e.

Ez sipasiyê Xwedê dikim.

❖ ❖ ❖

Bêzarî hew evîna min e, torebûn, şêtbûn, bêrûmetbûn, ez cejna hemî têkperrîn û bobelatên wan dizanim. Hemû barê min hat danîn. De em firehiya bê gunehiya min, bêyî gêjbûn binirxînin.

Yekcar ez hew dikarim. Ez xwe bawer nakim ku ez ber bi ahengekê ve diçim ku ÎSA tê de bibe xezûrê min.

Ez girtiyê awezê xwe nînim. Min got:

Xwedayo! Ez azadiyê di rizgariyê de dixwazim:

Ez dê bi çi awayî bi pey kevim? Gewîbûnê ez li şûn xwe hiştim. Îca xwe gorîkirin û evîna xwedayî yekcar hew pêwîst in. Ez xema vê serdema dilên hestdar naxwim. Her yek vejînên xwe heye, dilreqî an dilovaniya xwe heye. Li ser serê vê mêrdewana fireşteyî ya çêja saxlem ez cihê xwe ji dest bernadim.

Lê belê kêfxweşiya çespandî, çi malbatî be an na... nexêr, nikarin pê, ez pir bela-wela me, pir bêhêz im. Jiyan bi kar geş dibe, ew, rastgoyake kevnar e: Ez, jiyana min têra xwe giran nîne, difire û li dûr, li ser serê kirinê, geryanê dikę, li ser vê xala giranbiha ji cîhanê.

Dema ku ez wisa cegerdariya evîna mirinê di xwe de hejar dibînim ez çiqasî dibim mêrebî !

Xwezka Xwedê aramiyeke ezmanî, hêminîyeke esmanî, nimêj, pêşkêşî min kiriba, wek ewliyayên kevnar. Ewliya! xurt in!

Xelwetgir hunermend in mîna ku tu kes hew bixwaze pêkenîneke herdemiyê! Dê bêgunehiya min, min bi girî ve ke. Jiyan pêkenîn e û pêwîst e li her derê bê peşandin.

Bese ! Eve seza. -birêkevin!

Ax herdû pişk dişewitin, herdû cênîk gurme gurmê dikin ! Di çavê min de şev digindire, li bin vê rokê! Dil, hemî endam...

Çelo em ber bi ku de diçin? ber bi şer de ? Bêhêz im xelkên dîtir bi pêş de diçin. Alav, çek... kat!..

Agir berdin ! Min gullebaran bikin! Ha li vir! Yan ezê radest bibim, tirsonekino! Ez xwe dikujim! Xwe davêjim ser piyên hespa!

Ax!

Ez dê hînî vê yekê bibim.

De bila ev yek jiyana Firansiyan be, rêça şerefmendiyê!

Dawî

Wergerandin: Ehmed Huseynî

Çavkaniyên wergerandinê
Rimbaud: Jiyan û helbestên wî, Xelîl Xûrî 1978. Bexdad (Erebî)
Kovara El-Karmel. Hejmar 43.1991. Noqosiya (Erbîl)
Kovara Derwaze. Hejmar 1. 1993. Danmark (Soranî).

Çîrok

Ez berze me

Babê Roja

Dem: Dema berzebûnê

Cih:Cihê duhî û evro û sibehî, pêtir nêzîkê rastiyê, şeqama serekî li Dihokê.

Ez yê li wêrê rawestiyayî bûm û min diviya derbas bibime rexê dî. Rawestiyana min dirêj bû çunko wê gavê çiraya kesk bo tirimbêla helbibû. Lê bo mirovekê wekî min di demê berzebûnê da dijît, xem nebû hindî rawestabam, çunko dem yan demjimêr di ferhenga min de nebûn. Bê ku min bivêt ez ketme derya malxulyanê, hizra min kete ser hindê, kengî, çawa?

Min dizanî ku xelkê bi min dikire kenî. Ez pê dihesiyam hekû bi kêmatî berê xwe didan min. Min gelek cara guh lê dibû hindek da bêjine hindekêt dî!

-Xwe veden dîno yê hat.

Erê bi Xwedê bi hemî tiştêt min dikirin kenî, rêveçûna min, rabûna min, rûniştina min, rengêt cilkêt min. Bi kurtî dîtina min li nik xelkî cihê pêkenîn û pêtiranka bû. Belê ma min çi jê bû? Min baweriyeke mezin û mikum bi xwe û kiryarêt xwe hebû, min çi cara xwe nedidît mirovekî dîn, belê mirovekî berze. Şûna hindê xelkêt rexudora dihatne pêş çavêt min wekî dîn û bêhişa. Min gelek cara diviya bi hindeka bikeme kenî, lê min xwe radigirt û berê xwe jê dida paş da ji bîr bikim û pê nekme kenî da ew jî pê nezanin ku min ya berê xwe dayê da şerm ji xwe neke.

Hesta berzebûnê li def min peyda bû demê babê min, berî çend saleka, jineka dî bi ser dayka min re înayî û bi rojekê hatî guherîn ji mirovekî dilovan û dilnerm bo mirovekî bê hest û dilreq. Ji bilî lêdan û qutana min ji desta dixwar, hizar hizar cara jiyê min kurt dikir bi nifirîna û daxwazêt nexweş. Çi xoşî bo kesên di malê de nedihêlan, nexasme bo min û dayka min. Dayka kevinherwekî em çi yêt wî ne. Erê bi Xwedê min gelek cara guh li hevwelatiyê pêla duyê bûbû, lê min çi cara hizir nedikir ku dê carekê bibme hevwelatiyê pila duyê di mala xwe da, di nav birayêt xwe da. Hesta berzebûnê li def min pêtir lêhat demê ew dîwarê min pal didayê heriftî û dayka min -piştî jiyaneka rezîl û nexweş- xûşî dîtî û bo xwe mirî. Lê hesta gerdûna mezin li def min nemir belkî pêtir lêhat. Çinko min çi cara xwe nedidît mirovekî kêmbiha, ew jî ji ber hindê ku min hej jiyanê dikir, min hej mirovan dikir, îcarê birayêt xwe ewêt nîvebira.

Hesta berzebûnê li def min nedimir hindî min tiştêt entîke li vê dinyayê dîtiban. Ma çi ji hindê entîketire ku dayik û bab pêk nekin, xuşk û bira hej êk û du nekin, heval û heval bêdiliya êk biken?

Ez ji derya hizra derketim, li ser giriyê zarokekî yê li nêva şeqamê rawestiyayî, nizanît dê kî ve çît, haha dê nûke trambêlek lêdet, car yê sîng û sîng diçît paşiyê li ser pê xwe vedigerît û car yê bo destê rastê pêngavek duya diçît, paşê bo destê rastê dizivîrît min zanî ew jî yê berze ye, yê şepirze ye, yê bê xudan e wekî min, dilê min bo sot. Bi du sê pêngavêt mezin min xwe gehandê û rakêşa cihê peyada, cihê yemanê. Min destê xu bi ser serê wî yê biçîk re îna xarê û jê pirsiyar kir?

- Te çi ye mama tu husa dikeye girî?

Serê xwe bilind kir û bi dengek dilsoj bersiv da:

- Ez... Ez... yê berze bûyîm.. ka.. ka.. dayka min.

Min rondikêt wî ji ruwa vemaliştin û gotê:

- Xema nexwe mama were da biçîn li dayka te bigerîn.

Min kire milê xwe û wî xwe bi min ve kire tilûve. Ez pê hesiyam ku dilê min divêt tiştekî bibêjît.

Piştî ku min guhê xwe baş dayê, min guh lê bû yê dibête zarokî "xuzîkêt te ey zaro nûke yan bêhneka dî deyka xwe ya berze bibînî û dê tena bî, belê tu çi dibêjî bo xwedanê vî dilî".

Helbestvanê ku bi Şûrên...

Destpêk. r. 9

wisa be çima helbestvanekî mezin Helepçeyê bi vî awayî tîne zimên:

-Helepçe kuştin, tişt tê de nehiştin.
Bumbe li me barandin
Zarok çilmisandin.

Mane hemî rêxistin û partîyên Kurd ên sîyasî di belavokên xwe de ev peyv şirove kiribûn, îca wezin û qafîye ji wan belavokan kêm bûn, an çi...?!

Îro hin ji niviskarên me li ser zimanê lawiran dinivisînin. Di nivîsên xwe de li ser mişk û pisîkê, gur û mihê, rovî û mirîşkê dipeyîvin. Tu dipirsî ma ev ji bo çi ye? Ji te re dibêjin "Ey nezan, pisîk û gur û rovî dagirker û dijmin in, mişk û mih û mirîşk jî Kurdistan in!! Ma ji bo çi tu xwe li ber naxînî?"

Ez bi xwe vê navnîşana jêrîn ya helbestvanekî tênagihêjim, tika dikim jî ku tucarî, tê negîhêjim: "Dîlawer... Di cenga dêwê reş de". Bê guman navnîşaneke wisa nêzî filimên **Tarzan** e, ne ku navnîşaneke helbestî ye. Ji xwe eger em bixwazin li ser helbestvanîya helbestê bipeyîvin, dê cureyek ji cureyên xeyalê be, deq (tekst) bêreng û nedîyar in, peyv û gotin cûtî û dûbare kirî ne, durişme bi keldan û grikî ne, ziman jî peyvên biyanî (Tirkî û Farsî) di xwe de bi gewde dike, bi bahana ku her peyvek ne Erebî bêguman dê Kurdî be!!.Wek nimûne ez dixwazim bêjim ku **Salihê Heydo** bi vî awayî ziman zengîn dike:

Ji bo soxtinê, soxin a **Farsî** bi kar tîne, ji bo xweşik û çeleng û nazenîn û narîn û nazik û perî, qeşeng a Farsî dinivisîne. Her weha dîwana xwe ya duyemîn bi navê "Birîna Kûr" bela dike. Dîwan ji helbesteke dirêj bi qasî 35 rûpelan pêk tê.

Çîroka helbestê jî bi kurtebirî ev e: Pîremêrek tê cem "**S. Heydo**" û navekî Kurdî ji lawê xwe yê nûhatî re, jê dixwaze. Helbestvanê me, ji pîremêr re, dest bi hêjmartina kuştarên Kurdistanê dike, ji Medyayê û Dêrsîmê û Mehabad û zêwayê ta Helepçeyê. Û ji Pîremêr re dibêje de anuha bifermo û navekî ji kurê xwe re hilbijêre. Piştre pîremêr keserekê vedide û biryarê dide ku navê (Haştî) ji kurê xwe re hilbijêre. Bê guman ev tişt tev helbest e an bi awayê helbestekê hatiye nivisandin. Bi rastî wek ku min ji wî nas kiriye (mebesta min ê helbestvan e) dema ku dibêje "Haştî" mebesta wî "Aştî" ye. Lê bi herhal dema ku yê pîremêr vî navî ji kurê xwe re hildibijêre, valahiya ramanî ya helbestvan nîşan dike. Çinkî ew naxwaze ku nakokiyekê durust bike, lê dixwaze bêje: ku gelê Kurd aştîxwaz e û pêşverû ye; îca reng e partiyên komunîst; nokerên dîroka Kurd û dîroka Marksîzm-Lenînizmê, bi çavekî dîtir li miletê Kurd temaşe bikin.

Îca wisa... Di çarçewa xwe ya gişti de dîmen nezelal û ewrgirtî dixuye, herweha xweşbîniyeke rastîn diyar nake, digel ku a nuha çend navine ciwan hene ku di sîtavê de dijîn, lê mirov dikare bêje ku di pêşerojê de dikarin vê berpirsiyariya mirovayî û netewî li ser milên xwe ragirin; wek **Ferhadê Ecmo, Rizo Xerzanî, M. Ebdo Şorikî, Royarê Amedî**. Herweha çend navine dîtir ku bi Kurdî û bi Erebî dinivîsînin; lê hê jî ezmûneya xwe ya bi Kurdî nivîsînê bi pêş de nebirine...

Îca, berpirsyariya me tevan ew e ku em zimanekî çandeyî pêk bînin. Zimanek ku bişê li beramber zimanê dagirker raweste; ku dengê me bêyî kûrekûr û qajeqaj, bêyî mişk û rovî ; dengekî zelal û paqij, bighêje xelkê.

Xelkê, rewşa ku îro em tê de ne berya sedsalî derbas kirine. Qonaxên bi vî awayî di jiyana xwe de qonaxên reş û zuha dinavînin.

Kurtepistek: Di guhê nivîskarên nûhatî de: wek mirov û wek Kurd gumana min li ser tu kesî ji we nîne, herweha wek mirov ez dişêm bibim hevalê her yekî ji we, lê eger çîroka aferandin û dahênanê li holê be, îca dibe tiştekî din, tika dikim! Ne hema bi helbestê mirov dibe kesekî bijarte !!!

□

www.kurdishmuseum.org

Helbestvanên ku bi Şûrên Textînî Şer dikin

Taha Xelîl

Di van her pênc salên dawîn de destpêka bizaveke edebî li Sûriyê serî hildide. Ev bizav, di navbera partiyên siyasî û kesên serbixwe de tê parvekirin û bi awayê çapemeniya Kurdî, weşandina kovarên wêjeyî -çi bi Kurdî û çi bi Erebî- tê bi gewdekirin. Kovarên ku îro li Kurdistana Sûriyê tên çapkirin û belavkirin ev in:

Zanîn, Aso, Roja, Gurzek Gul, Pirs.

Li gel derçûna van kovaran, navên çend helbestvan û çend çîroknivîsan û rexnegir û zimanzanan jî hatine nasîn.

Bê guman nivîsandina li ser vê babetê bi du hêlên serekane dest pê dike:

1- Hêla Kilasîk: Bi nûneriya Mele û Şêxan e, ku bi çand û zanînên xwe, xwe dispêrin Elfabeya Erebî û xwendina Quranê, çinkî bi dehê salan feqetî kirine; li gel ezmûneyên xwe ên şexsî (siyasî û civakî). Ev ber di sewiyetên hişyarî û têgihiştinên hunerî de ji hevdû cihê ne, xwe bi awakî zelal ji Cegerxwîniyê rizgar nakin. Di gel ku hin ji wan xwedan taybetmendiyên serkeftî ne jî. Wek **Yûsivê Berazî** (Bêbuhar) ê ku di şînîyek narîn de û di xemgîniyek nêzîkî dil de bin av dibe, herweha ê ku pir kêm xwe dispêre durişmên zuha, vajî nifşê xwe, ev nifşê ku her û her dîlê paşeroj û kevneşopiya xwe ye. Wek **Tîrêj, Keleş** û **Xelîlê M.Elî** (ê ku bi zanîna xwe, xwe dispêrin xwendegeha bilind), lê ên mayî, eger navên wan derbas bibe gerek peyva SEYDA li pêşî hebe.

2- Hêla Nûjen: Peyva "Nûjen" wek tecawiz bi kar tînim. Mixabin ên ku pêwîst e bi vê erkê rabin, bi tiliyên destekî tên hejmartin, digel ku nav pir in jî, reng e neyên hejmartin.

Di vê nivîsê de ezê hewl bidim ku li cem vî berî rawestim û çend sîmayên wî ron bikim, bi hêviya ku di munasebetek dî de bikaribim çend taybetmendiyên berê klasîk bînim zimên.

Bê guman ez naxwazim wan helbestvanên ku di payiza temenê xwe de ne biêşînim. Çimku piraniya "dahênerên me!" dema ku li ser berhemên wan tê peyivîn û nivîsîn, wa dibînim ku li ser aliyê şexsî ê jiyana wan tê peyivandin û nivîsandin.

Bi her hal, tiştê ku wan helbestvanan kiriye mebesta min ê klasîk e, tiştekî mezine. Ev jî rastî ye, lê em, ên xort guftûgoyeke dirêj di navbera me de heye, çinkî ên ciwan di pêvajoya çand û wêjeya Kurdî de, dê xwedî giringiyeke pêşerojî bin.

Li Kurdistanê herkesê ku bixwîne an bi Kurdî binivîsîne, di destpêkê de, xwe wek helbestvan dide destnîşandan, piştre rexnegir û nivîskarê çîrok û romanê, piştre dest bi çêkirina ferhengan dike û lêkolînên mîsolojî, reng e dawî jî di bin siya "ku kes ji kesî çêtir tune ye" birame da ku partiyekê damezirî ne.! Xwedê **Cegerxwîn** û **Celadet** û **Kamûran** û **Qedrîcan** bi rehma xwe şa bike... Çiqasî mirovin e hejar bûn..!!

Ev nisbeta pir ji helbestvanan nîşan e ku çanda me ji dahênan û afirandinê vala ye, çinkî dema ku çand zuha dibe, dema ku gel dûrî mîrat û şaristaniya xwe dikeve, dema ku rewşa xerîbiyê dijî, wê gavê dest bi zimanê gazin û sûcdarî û dramayê dike. Ev jî bingeha helbesta Kurdî ya îro ye.

Hemî li ser "Helebçe" yê dinivîsin û helbestên xwe bi çêre û sixêfan -ji bo **Sedam, Rîgan, Mîterand**- dadigirin.

Li ser vê babetê **XEMGÎNÊ REMO** pirtûkekê belav dike û pirtûka xwe bi diran û neynûk û bi ferhenga çêran a ku ji gelek bajaran civandiye, diparêze. Lê **"JAN DOST"** pirtûkekê bi zimanê Erebî bi navê "Helbest û helbestvan" çap dike. Peyvên pêşgotina pirtûkê mirov dikare di nav livînan de ji jinekê re bêje.

"Nivîskarê nûhatî, dahênerê tenik, helbestvanê hestdar Jan Dost, bi destê me digre û me dibe serdana gulistanên aferandina Kurdî"

Ev helbestvanê tenik û hestdar û dahêner bi axaftina li ser giringtirîn helbestvanê Kurd (**Baba Tahirê Hemdanî**) dest bi pirtûka xwe dike û dibêje; "Baba Tahir ne helbestvanekî Kurd e, digel ku çend wişeyên Kurdî di helbestên wî de peyda dibin. Ev pirs pir diyar e û ne gerekî guftûgoyê ye."

Ez bi xwe nizanim Jan Dost ev bîr û baweriyên pûç ji kuderê anîne, û çawan dikare bi wan peyvên gerikî helbestvanekî Kurd ji holê rake. Mane bi "LORÎ" nizane, mane gerek bû ku piçekî xwe dûrî vê reqiya ramanî û vê payebûna korane bixista.

Bê guman nivîsên bi vî awayî gelek metirsiyan ji milletekî re durist dikin. Eger rojhilatzanek hat û xwest tiştekî li ser wêjeya Kurdî binivîsîne û ev pirtûka Jan Dost ket nav destê wî, bê guman dê ji xwe re bike çavkanî, bêyî ku bizanibe ku Can Dost, wek ku çawa **Elîkê Betê** ji lîska Têns tiştekî nizane, ew jî tu tiştî ji çanda Kurdî nizane. Her di vê pirtûka **Can Dost** de, di bin navnîşana "Nivîseke rexnekariyane li ser destana Mem û Zîn" em dibînin ku kesên destanê bi vî awayî dide nasîn.

Mem: simbolê evîn û mêraniyê ye...

Zîn: Nîşana dilsojî û bedewî û evînê ye...

Beko: Nîşanê gelacî û ziyan û fitneyê ye...

Bi vî şêweyî nivîseke rexnekariyane û hûrgilane li ser destanê nivîsî ye. Ev destana ku hîm û stûna çanda Kurdî ye.

Bêgûman "Lêkolînek" wisa , xwendevanên salên çarê an pêncê dema ku li ser Keroşk û Rovî dipeyivin, dikarin binivîsînin.

Îro gelê Kurd bêdezgeh û bêqanûn e, lewra (ew gel) û çanda wî û şaristaniya wî li ber sextekar û lîskkaran û li ber çavpanan vekirî ne. Lê mixabin, dema ku mirovekî perîşan nerazîbûna xwe nîşan dide, dibe dijminê çanda Kurdî, dibe dûvikê emperyalîzmê û siyonîzmê û îstîxbaratan, reng e çend daran bixwe û reng e debançe jî bên bikaranîn.

Helbestvanê dî, **Deham Ebdulfetah** xwe wek helbestvan, rexnegir, ramyarê hemî babetên Mîsolojî û Antolojî û Zanistîyên dîrokî û olî û mîratî û govend û wergerandin û şano û sîneme û lêkolîngerê bê hempa dibîne.

Di hunerên sporta Kurdî de, bi taybetî pêşbirka (Ralî ya turumbêlan) a ku her sal li Kurdistanê di navbera bajarê Mehabad û Amûdê de çêdibe, xwe wek zanyarekî pêşkêş dike!!! Pirtûkekê bi navê (wek ku ew dibêje) Nêrînek Rexneyî li Helbesta Kurdî belav dike. Hergav jî pirtûkên xwe bi du navan û bi du zimanan belav dike; Erebî bi navê xwe ê rastîn û bi Kurdî bi navê **Sîmyarê Yezdî**. Ez bi xwe nizanim ku çawan mirvek dikare ji neh mehan pêtir li gel mirovekî din bijî!!!?

Mamosta **Deham** xwe bi xwe li ser pirtûka xwe dinivîse û dibêje ku ev lêkolîn yekem lêkolîn e di dîroka Kurdistanê de, herweha giringtirîn û kûrtirîn e; ji serdema Kardoxîyan ta nuha. Bêguman van peyvên jorîn wek pêşgotin an paşgotin dinivîsîne,ne wek wan nivîskarên ku rû bi rû carcaran pesnê xwe didin û em jî ji wan re derbas dikin!!

Di bawerîya min de ku ev bara (haleta) xwenepixandinê ya ku -dahênerên- çanda Kurdî pê ketine, metirsîyan bi xwe re tîne, herweha pêwîst nake ku em bi nermî û piştgirî li gel rawestin, çinkî di şaşitî û tevlihevîyên xwe de pir jîr in, bi navê Kurd û Kurdistanê ji vî serî diçin wî serî, ava dikin û diherifînin, bê seza û bêyî çavdêrî ji vir û wir didizin û werdigrin, ev jî şermeke mezin e!!!... **Hêmin û Xanî û Cizîrî û Dêsoser û T.S.Elyot û Tşomiskî** davêjin gemargeha dîrokê!!

Îca emê çawan li ser çanda Kurdî bipeyivin? Ma gelo ez li ser xwe dipeyivim, ez -**Taha Xelîl**- ê ku hê jî zimanê xwe yê zikmakî wek ku pêwîst e nizane, an ez li ser wan kesên ku xwedî firoşgeh bûn û piştî ku di bazirganîya xwe de têkçûn dest bi bazirganîya çand û wêjeyê kirin, an li ser berpirsiyar û niviskarên wan kovaran ku didin xuyanîkirin ku **Çekof** pir kêfa wî ji çîrok û romanên Kurdî re dihat- wisa nivîsandî heye- an jî ez li ser dahêner -**Sîyamend Îbrahîm**- bipeyivim, Sîyamendê ku berya nuha ferhengên Kurdî çêdikirin û nimûneyên wek:

-Şêrîn pora xwe bi şimikê şeh dike!

-Batincana sor... Batinca reş! Di ferhengên xwe de pêşkêşî xwendevanan dikir. Wisa dev ji karê xwe berdide û ji nişkê ve dibe berpirsiyar û nivîskarê kovara (**Aso**), her weha dibe berpirsê çapkirina dîwan û çîrokên Kurdî, û dest bi nivisandina pêşgotinên lawaz dike, pêşgotinên wan pirtûkên ku bi hezaran li miletê me tên belav kirin, ev miletê ku dahênerên wî bûne bela û ketine stûyê wî!!

Zencîra mit û matîyê li vir ranaweste, çinkî **Ehmedê Icê** jî xwedî roleke mezin e di vê qonaxa raperînperest de. Kovarekê diweşîne û navê destgirtiya xwe li kovarê dike **-Roja-**, bêguman di destpêkê de me wek mafekî şexsî û însanî û pir xweşik li çîrokê temaşe kir, lê problem ew bû ku hemî helbestên kovarê li ser -**Roja**- û evînbazîyên wê bûn, ta ku me wa hest kir ku navê Kurdistanê ê dîrokî **roja** ye. Helbest jî -wek nimûne- bi vî awayî dihatin nivisandin:

-Roja.. ronîka cîhanê ye!

-Roja.. ji çemê şîr û hingiv e!

Piştî wê min jî rabû û helbestek ji kovarê re hinart, lê kovar rawestîya û helbesta min ronahî nedî. Navê helbesta min -Roja Qamişlo borg bû! Bi vî şêweyî hatibû nivisandin:

-Roja ji bo bêhna bin çenga ye..

-Roja ji bo spî kirina dirana ye..

-Roja ji bo kin kirina zimana ye..

Piştî vê dest pê dikin û dibêjin ku ez henekê xwe bi çanda gelê xwe dikim, ku ez li beramber dahênerên çanda gel serî hildidim, îca li min dixînin û dûvika ji min re çêdikin, ku ez noker û sîxur û bi rêxistinên li dijî Kurdistanê re dixebitim. Ne tenê ez, lê **Brahîmê Yusif** ê helbestvan jî çinkî carekê li ser vê rewşê nivisandibû, lêxistinê dixwe.

Ji hezarên salan de Kurdistan koloni ye. Di mirovatîya dagirkeran de tu tişt ji bilî zorbazîyê, hovîtîyê û gemkirinê û paşvemayînê nebûn. Neşîya çandeke mirovane yî taybetmend pêşkêş bike û ne jî rê da gelê me ku rola xwe bi kar bîne û çand û bingehên şaristanîya xwe biguhêze û wergerîne, herweha ên ku guh dan vê hêlê û hewl dan da ku çanda me biparêzin, hatin girtin û dûrxistin û gem kirin û carna jî gihîşt sînorê kuştinê, lewra çanda me di beşê xwe yê mezin de devikî di stran û lawik û heyranên dengbêjan de mabû.

Xala herî seyr ew e ku hemî niviskarên wêjeya Kurdî bi zimanê bîyanî hîn bûne û herweha bi wan zimanan jî xwendine (Tirkî, Farsî, Erebî), nivîskarên me gelek berhem û pirtûk bi wan zimanan xwendine, wate, bûne xwedî gencîneyeke çak. Dema ku li ser berhema niviskarekî bilind ê Ereb dipeyivin, bi bîr û baweriyên dirûst guftûgoyê dibin dawî. Lê dema ku bên û li ser berhemên Kurdî binivîsînin an li ser bipeyîvin, em dibînin ku dest bi tevlîhevîya peyv û baweriyan dikin, reş û spî têkel dikin, realîsta zuha û pesindana bêreng li bin guhê hev dixin, huner, sîmbol û form û naveroka ku li ser dipeyîvin (mebesta min li ser wê berhema bi Erebî) ji bîr dikin.

Ta nuha helbestvanê me bi axîn ji yara xwe re dibêje:

-Yarê ez ji te hez dikim û bi evîn im

-Tu dûrî min î .... lewra ez xemgîn im.

Lê dema ku wek vê helbestê bi zimanekî dîtir dixwîne dilê xwe jê dixelîne..! Ma gelo em nikarin vê bara hunerî û vê bawerîya durust li gel afirandina Kurdî biguncînin?

Ne xwe dahênerê Kurd ne li ser giyanê xwe û ji giyanê xwe re dinivîsîne, lê li ser ê dî dinivisîne, jê we ye ku dikare ê li dervî xwe ji xwe bêtir têbighêje. Dema ku li ser "Helepçeyê" dinivîse ne bi hest û bawerî û nêrînên xwe dinivîsîne. Lê reng e bi hestên xelkên Helepçeyê ên kuştî û şehîdbûyî dinivîsîne... A rastî ku çiqasî hewl bide jî dê neşê!! Eger ne

Dûmahîk: r.8



Teha Xelîl

DORMARÊ LİCÊ RA HÎRÊ DÊRÎ

■ Arêkerdox: M. LİCOKİC

EHMEDÊ MUSÊ AXAN

Ehmedê mi lawo, payîz o, ver bi zimistan o (1).
Mi to ra va "Ma şin welatê Şekeryano, miyanê lemikê sorano".
İnze (2) serê sibay mesîne gêna şina desmacano,
İnze gava g' (3) hanêna (4) Delû Fikrî (5) giroto pey banano
İnze geyrena a (6), vana: -Ehmedê mi, lawo! Çadirî zey sitaran ê!
Ehmed vano: -Dayê, hela şore (7) vace "Ti ma ra kenê çi galegalano?"

Delû Fikrî vano: -Ma kişenê serekê axano.
İnze vana: -Hela ti biwane, kam û kam o?
Vano: -Jo (8) tera Ehmed lacê Musê Axan o,
Wahîrê hîris û hîrê dewan o, wahîrê vîst û panc hareyan (9) o.
Vana: -Ehmedê mi mekişê bi singuwano!
Ez o hîrê ray şima rê berzî verê zêran o.
Vano: -İnkanê (10) cê (11) çinyo,
Ma go (12) Ehmedî **bikişin** (13) bi singuwano!

İnze linganê xu dana şimikan ro, yena vana:
-Ehmedê mi, lawo!
Delû Fikrî Paşa vano "Ez o Ehmedî bikişî bi singuwano."
Ehmed vano: -Ez o **di** dadê (14) Delû Fekrî zit nî!

Ehmed tivingê xu gêno şino binê keyan di çok dano,
Kişeno hîris û hîrê neferan o.
Fîşekê cê qedênê, miyanê meydanî **de** ciwab dano.

Serê Ehmedî **de** leqeleqê axirmakînan o,
Ehmedî kişenê bi singuwano.
İnze vana: -Lawooo! Hey lawo! Ehmedê mi, hey lawo!*

(1)Mi ena dêre (deyîri), amnanê 1992 di fekdê Îbrahîmê Zenge ra nuşti (Zenge, dewêka Licê ya). Varyantêk na dêri hûmara 138. a Armanc di veciyabi.
(2)**İnze**, dadê (maya) Ehmedê Musê Axan a.
(3)**gava g'**: gama ki
(4)**hanêna**: ewnêna, hewnêna, ownêna
(5)**Delû Fikrî**, qumandanêk eskerê Tirkan o.
(6)**geyrena a**: agêrena, egeyrena
(7)**şore**: şo, şû
(8)**jo**: yew, yo, jew, jû, zû
(9)**hare**: arê, ayre
(10)**înkan**: îmkan
(11)**cê**: ci, jey, yê
(12)**go**: kû, ki;ko, do
(13)**ma bikişin**: ma bikişî, ma bikişîme
(14)**dadî/dadê**: dayki, ma, may, mar-i

MEŞKÊ (1)

Lo dewo (2), lo dewo, lo meşkê
Lo dewo, lo dewo, lo meşkê

Lo dew, min meşke şawa (3)
Lo dew, to meşke şawa

Do nanîk o (4), rûn ça wo?
Do nanîk o, rûn ça wo?

Mi d' kutikî warî nawo
Mi d' kutikî warî nawo

Kutikan meşke dirnawa
Kutikan meşke dirnawa

Meşke meşkê Pîr 'Eyşane
Meşke meşkê Pîr 'Eyşane

Min keyandî (5) l' eywane
Min keyandî l' eywane.

(1)Mi ena dêre Licoki di eşnawita (Licoki, dewêka Licê ya).
(2)**dew**: (Kurmanckî di) do
(3)**keyandin**: (Kurmanckî di) nîritiş
(4)**min şawa**: mi tê şanaya, mi şaya tê
(5)**nanîk o**: hinik o, hanîk o, hanî yo

A Çİ KEYNA WA

A çi keyna wa **di** miyanê keynan **de**? (1)
A çi hurma (2) wa **di** miyanê keynan **de**?

Poro sûro **di** miyanê milan(3) **de**
Poro sûro **di** kift(4) û milan **de**

Xuşî bazinan yena destan de
Şingî bazinan yena destan de

Xurmî xirxalan yena lingan de
Xuşî xirxalan yena lingan de

Perên(5) sûr o, şeşever o
Poto(6) sûr o, şeşever o

Mêrde bimro go(7) kam bero?
Mêrde bimro go kam bero?

Mêrde bimro ez o berî
Mêrde bimro ez o berî

Qalin çiqa? Şeş hezarî
Qalin çiqa? Şeş hezarî

Eger şoro(8) duyes hezarî
Eger şoro duyes hezarî

Ez o berî qeybê(9) 'eks û înatê şarî
Ez o berî qeybê 'eks û înatê şarî

(1)Mi ena dêre Licoki di eşnawita (Licoki, dewêka Licê ya).
(2)**hurma**: cinî, cenî
(3)**mil**: 1)doş, pol 2)vile, vîye
(4)**kift**: paştî, pol
(5)**perên**: pirên
(6)**pot**: fistan
(7)**go**: ko, do
(8)**şoro**: şêro, şiro
(9)**qeybê**: qey, qay, qaydê, semedê, seba

Arêkerdox: Malmîsanij

FOLKLORÊ MA RA ÇEND NUMÛNEY

JN Weşanên Jîna Nû

adresa xwestinê:

Weşanên Jîna Nû
Box: 30
740 22 Bälinge
Sweden

DAYKA Mİ

■ M. MERGÊRÊZ

Dayka mi,
Se bo tu?
Qey o tir mil kot tu ver?
Qey o tir dêst kot tu qesibi dayka mi?
Ti îna nebiya,
Tu dan xwi ver,
Ti daymiş bîn.
Tu nêvatîn "Nuştê çarî yo".
Tu vatîn belay min o, qeday min o
Pêy hebê mi yena gidîno.
Mi rona ti nêdiya,
Gelo ti bedîlawa?
Durşîm tu nîno mi vîr.
Huyayîş tu cî,
Towê nîno mi vîr,
Her çî sê honî yo.
Çimon tu ez xeyal keno,
Sê tîj beriqên.

Bela hesro ra bi
Bela nêy.
Ez çi zono dayka mi,
Ti hêdî hêdî bermên,
Bermi hîn faydi nekeno.
Tu hêdî hêdî hesir rijnen
Hesrî z' hîn faydi neken.
Ti mijmijên,
Tu vatîn wa vengê mi neşêro çebî,
Vengê tu z' hîn faydi neken dayka mi.

De vac keserê mi,
De vac yesîrê mi,
De vac bêsuhudê mi.
Sarê xwi mûn çaqû ra vec,
Hesronê xwi hîn bester,
Niqongon xwi hîn bibirni û şû zeri,
Kincon xwiyê newon pira gîr
Û her çî xwi vîr a biki dayka mi.

De goş xwi tevêr ser ni,
De bonî dormalê xwi,
Gurgurê def û zirna wa,
Reprepê govendê comêrdon a.
Tilîlîyê cinîyon û keynon a.
De wurz hîn ti cî debi înadê dişmenon ra,
Yew lingi ti cî pure di.
Qey qêyom neqomawa dayka mi!

Gulana 1992

cî: zî, kî
çeb: yew, çew, ço, çikes
def: dawuli, neqra
dormal: dormar, dormare, dorme, çorşme, çoşme, çarqirni, çaqirni
faydi: fayde
hîn: hinî, êdî, hindî, endî
hon: hewn
huyayîş: hiwayîş, huwayîş, hewayîş, wiyayîş
îna: wina, ena, enawa
kincî: cilî
mûn: miyan, miyon
onîyayîş: ewnîriyayîş, ewniyayîş, hewniyayîş, honeyîş, winiyayîş
o tir: o tewir, o tur, ay tewir, ayawa, ay hewa, o qeyde
pure di: piro di; bidi piro
rijnayîş: rişnayîş
şuhud: su'ud, si'ud, bext, talih, şans
tever: teber
tîj: tînci
towê: teba, tebayê, çîyê, çîyekî
wurz: werzi, wardi
yesîr: hêsîr

www.arsivakurd.org

Konferansa zimên qonaxeke nû ye...

pêş nakeve."

Di dawîya konferansa Navnetewî ya "Zimanê Kurdî Ber Bi Sala 2000 î" de, desteyek ji konferansgêran rûniştin û bi bersivdana pirsan di dawîanîna konferansê de hizr û bîrên xwe dîyar kirin.

Li Parîsê, bi germbûna dilan ber li sermê dihate girtin, lê Parîsê bi gelek bûyerên din dagirtî, jîyan hembez dikir.

*Di hin kovarên Frensî de jî li ser ziman û alfebaya Kurdî nivîsên Pierre Rondot derketine. Wek nimûne:

1-Pierre Rondot, "Publication kurde en caractères latins" (Extrait du Bulletin d'Études Orientales de l'Institut Francais de Damas, T. II), Le Caire, Imprimerie de l'institut Français d'Archéologie Orientale, 1933, 7 rûpel

2-Pierre Rondot, "Les Kurdes de Syrie", La France méditerranéenne et africaine, Librairie Sirey, c. 2, fas. 1, rûpel: 81-126, Paris, 1937 (1939?)

3-Le Général Pierre Rondot, "Les Revendications nationales Kurdes 1943/1949", Cahiers de l'Orient Contemporain, 1949, XVIII-XIX, rûpel: 65-67

4-P. Rondot, "Le mouvement national kurde en 1946", En Terre d'Islam, Paris, 1947, 2ème trimestre

5-P. Rondot, "L'expérien-ce de Mahâbâd et le problème social kurde", En Terre d'Islam, Paris, mai-juin 1948

6-Pierre Rondot, "L'Adaption des caractères latin et le mouvement culturel chez les kurdes de l'U. R. S. S.", REI, 1933, Cahier 1, rûpel: 87-96

7-Pierre Rondot, "L'Alhabet kurde en caractères latin d'Armenie sovietique", REI, 1933, 3, rûpel: 297-307

8-Pierre Rondot, "Trois chansons kurdes", Cahiers du sud, 1945, 274, rûpel: 816-824

9-Pierre Rondot, "Trois essais de latinisation de l'alphabet kurde: Irak, Syrie, U. R. S. S.", Bulletin d'Etudes Orientales, Şam, 1935, 5. □

Lawê gelê Kurd

Hayrettîn Yıldız

Di 10.12.1993'an de li Diyarbekirê bi destên hêzên tarî hat kuştin. Emê wî tu carî ji bîr nekin.

Ji Almanyayê

M. Ali Yıldırım, Giyasettin Yıldız, Vahdettin Akkuzu, Adnan Kurt, Osman Çınar, Bavê Azad, Mehmet Tanrıverdı, Mustafa Öncü, İbrahim Demirbağ, İsmail İlhan, Abdulselim Temiz, Mehmet Yıldız, Mehmet Bakır, İsmail Koyun, Sinan Stutgardi, Ferit Değmez, Murat Acar, Adnan Tutulmaz, Fettah Çetin, Aşık Temelli, Şeyhmuz Dalmış, Ahmet Tutulmaz, Cemal Lübeki, Şerif Müştak, Suphi Karaalp, Aydın Sarı, Selahatin Avay, Dîyar, Mehmet Er, İhsan Akbaş, Mahmûdê Malazgırti, Reşit Aksu, Mehmet Ateş, Silo Tarî, Çetin Ekinci, Mahsum Arslan, Sinan Alabay, Abdurahman Madak, Fethi Yüzücü, Cemal Aba, Hudıda Aras, Rıfat Coş, Mustafa Müncitekin, Xalê Nusret, Salimê Cellê, Ali Rıza, Ali Tepe, Azad Demirbağ.

Xaçepirs

Amadekar: S. Rêving



Çeperast: 1-a- Navê pira di navbera Silopî û Zaxoyê de. Pira ku gumruka Tirkiye û Kurdistana Federe li ser e. 2-a- Zarok, minal (berevajî) b- paşdaçekek. 3-a- Ji xeynî, xeynî. b- Ne mê (berevajî) 4-a- ode yan beşên karûbarên resmî yên dezgehên dewletê b- manî, engel. 5-a- Daçekek (berevajî) b- hêt. c- vexwarineke serekî. 6-a- Kulîlka nîsanê. Kulîlkek di meha Nîsanê de şîn dibe, di şiklê Laleyê de ye. b- Ji navên kuran 7-a- Rengek (berevajî) b- evrazî c- Ji kurkê mele û sofiyan re tê gotin, qapût. 8-a- Ji navên jinan (berevajî) b- Xwendina herfekê. c- dîn, ayîn. 9-a- Miletek ji miletên cîranên Kurdan. b- rûyê ku deq li ser hene, belekî. 10-a- Kesê ku guhên wî nabîhîse. b- Kurtiya navê Ordiya Rizgariya Îrlandayê, bi Îngilîzî 11-a- navê rojekê b- Dema ku pez bi şev derdikeve çêrê. c- aleta ku mirov pê qermîçokên cilan rast dike. 12-a- Gotina qedeha meyê lihevxistinê b- Li gundên Kurdistanê cera mezin ya ku havînan avê sar dike. c- Hîç, qet (berevajî)

Serejêr: 1-a- Paçika ji bona ku zarokên bişûk dema xwarinê dixwin, xwe nelewitînin, mirov di ber wan de dadeliqîne. b- Kesê ku mirov pê bawer. 2-a- daçekek (berevajî) b- Li devera Botan şiklekî hirmiyê ku mezin e û aliyekî wê sor e. c- sînonîmeke "ne, na". 3-a- Komir. b- Piştî durûna gemin, koka genim ya ku di erdê de dimîne (berevajî) 4-a- Ar, ateş. b- Di destana Mem û Zînê de mirovê fitneçî û dilreş (berevajî) 5-a- Bilind. c- Emeg û xwîdana yekî ya ji bo kar. 6-a- Hêştir, dewarek ku bi piranî li welatên germ wek dewarê bar tê bi kar anîn. 7- Li Îtalyayê bajarek. b- Peyva pesindanê, razîbûnê.8-a-Hejmarek (berevajî) b- Bûz, cemed. (berevajî) 9-a- Pronavek b- Roj c- din. 10-a- Keriyê heywanê kovî. b- pozbilind, ji xwe pir razî. (berevajî) 11-a- "Mêrê" bizinê. (berevajî) b- kesê ku di mehkemê de yê gunehbar diparêze. 12-a- Kulek b- Li devera Şirnexê ji "sînî" ya xwarinê re dibêjin. c- Kar, şuxil.

Bersîva hejmara berê

Dûmahîka nivîsan

Şerê navxwe

birîndar bûn. Li gor beyana YNK'ê ku di 27'ê Çileya Pêşîn de ji raya giştî re belav bû, pêşmergên Yekîtiyê li herêmên Ranya, Qaladiz, Kifrî û Kalarê pêşmergên Tevgera Islamiya Kurdistana Iraqê bê tesîr kirine, tenê li Halepçê di navbera wan de şer dom dike.

Sebeba şerê ku di navbera YNK û Tevgera Îslamiya Kurdistanê de derketiye ew e ku Tevgera Îslamiya Kurdistanê qerara Hukûmeta Herêma Kurdistanê neaniyê cîh û çekên xwe teslîmê hukûmetê nekirine. Partiya Sosyalîsta Kurdistanê jî de eslê xwe de xwe fesh kiribû. Piştî ku Partiya Yekgirtin di Kongreya 11'an de bi PDK'ê rê dibe yek Hemê Hecî Mahmûd xwe wek mensûbekî Partiya Sosyalîsta Kurdistanê îlan dike û êrîş dibe ser pêşmergên PDK'ê.

Di dîroka Kurdistana Bakûr de gelek caran şerê birakujîyê di navbera hêzên Kurdan de rû dane û gelê Kurd gelek zerar ji wan ditîye. Di şerê di navbera PDK û YNK, şerê navbera YNK û PKI de gelek kadirên hêja hatin kuştin. Û dijminên Kurdan jî hergav ji vî şerê nav Kurdan feyde dîtin.

Herçiqas şerê îro ye ku di navbera hezên Kurdan de derketiye ne şerekî wiha giran be jî, di dema îroyin de ku li herêmê otoriteyeke Kurdan heye, hukûmet û parlamentoya wan heye, tabloyeke xerab dide raya giştî ya cîhanê. Dijminên Kurdan ku bi eşkere nikarin li hember Kurdistana Iraqê derkevin îcar dixwazin bi destê Kurdan hukûmet û parlementoya wan ji ortê rakin. Ji xwe Serokê PDK-I Mesûd Barzanî jî eşkere dike ku Mihemed Hecî Mahmûd têkilî bi mûxaberatên Îraqê û Îranê re hene.

Di dîroka Kurdistanê de ev cara yekem e ku Kurdan axa xwe rizgar kirine, bi hilbijartinan parlamento û hukûmeta xwe ava kirine û dewleta xwe ya Federe îlan kirine. Herçiqas di bin sîwana leşkerên Netewên Yekbûyî de ev qazanc heta cihekî tên parastin jî lê tîfaqa di navbera Kurdan bixwe de garantiya vê qazancê ye. Ku di navbera Kurdan bixwe de yekîtî tunebe, leşkerên herî giran û çekên herî modern jî Kurdan ji Seddam biparêzin, dîsa jî ewlehî li Kurdistanê bi cih nabe. Ma mînaka Somaliyê ne li ber çavan e? □

Welatê min hê jî....

memoste Mahmûd Lewendî bê çawa guhdarîya leheng û nevîyên Qewmê Çiyê dike, hingê ez pê dihisiyam ku mamoste Lewendî niha bi nevîyên Elîyê Ûnis re di qontara Çiyayê Mereto de şerê Zekî Begê Romî dike. Û di şevbêrkekê de li mala dengbêj Husênê Tewfo ez pê dihisiyam ku ew herdû leheng bi dengê H. Tewfo û awazên tembûra wî re vedigerin heyamê xortanîya xwe û govendên herêma Diyarbekir û Farqînê têne bîra wan.

Wiha piştî ku çûn bi pêlekî ez ji xwe re di rewşa wan de û di rewşa welat û welatîyên ku ji mêj ve canê xwe gorî xaka Kurdistanê kirine û li derveyî welatê xwe derbider mane û mirine, ponijîm û min ji xwe re got: Madem mirovên wilo hêj li welatê min peyda dibin dêmek welatê min bi xêr û bêr e, tirs nema heye.

Şabaş ji wan re yên ku li pey dîroka gelê xwe ne.

16. 10. 93, Qamişlo

Roja Nobel

kulturê ya dinyayê. Di 1986-an de Wole Soyinka, di 1991-ê de Nadîne Gordîmer, di 1992-an de Derek Walcott û xelatwergira 1993-an Toni Morrison... Nemaze biryarên van hersê salên dawiyê, pirên di nava elîta kulturê ya dinyayê û Akademiya Swêdê de xurttir kirine. Tarîx; 7-ê Mijdarê, saet; yekê paşnîvro, rojnamevan û kameramanên kanalên Tv yên cuda li ber deriyê sekreterê daîmî yê Akademiya Swêdê Sture Allén bi heyecan rawestiyabûn û guhdarî dikirin. Sture Allén biryara Akademiyê dide diyarkirin; xelatwergira 90-em, xwediya 6,7 milyon Kronan, di warê xelata edebiyatê de jina 8-em û Afroamerîkana yekem Toni Morrison e. Li pey hevdû du reşik... Guhdar bi pirsên cuda dixwazin motîva biryara Akademiyê baştir derxin holê; gelo reşikbûna Morrison tu roll lîstiye? Bi Îngilîzî nivîsandina wê tu tesîr kiriye? Yekî/yeka ku bi Japonî dinîvîsîne dê çawa bête bi qîmetkirin? Gelo ji ber ku ew dengê kesên ku tê eciqandinê bû, xelat hat dayin? û gelek pirsên din...

Gelek şaş dimîne, lê piranî di vê biryarê de, li gel xelatkirina şiyana edebî ya Morrison, piştgiriya têkoşîna li dij nîjadperestiyê dibîne û ji ber herdu sebeban jî biryarê teqdîr dikin.

Ji bo xelatwergirtina îsal, gelek nivîskarên navdar hatibûn pêşniyarkirin. Tevgera Aşitiyê ya Gel li bajarê Uppsalayê ji bo ku Akademiya Swêdê xelata îsal bide nivîskara Swêdê Astrid Lindgren, beriya ku Akademî biryara xwe ya ji bo îsal bide, dest bi îmze topkirinê jî kiribû. Li gor wan tu nivîskar bi qasî Astrid Lindgren nav nedaye û pirtûkên tu nivîskaran bi qasî yên wê nehatine wergerandin(Ez hêvî dikim ku Akademiya Swêdê dê rojek berî rojekê berê xwe bide vê nivîskara ku di dilê temamê zarokên dinyayê de xwedî hêlîna herî delal e). Lê hem navdariya nivîskarên ku hatibû pêşniyarkirin û hem jî hewildanên Tevgera Aşitiyê ya Gel li Uppsalayê têra tesîra ji bo biryardayinê nekir û Morrison bi îmtîhaneke serkevtî û bi ked û şiyana xwe ya nivîskariyê, rê li xelatkirina dengên mirovên reşik vekir. Li ser Morrison li gelek deveran gelek tişt hatin nivîsandin, ji ber vê yekê, ez dê bi tenê bi çend gotinên kurt yên li ser jiyana Morrison dawiya vê nivîsê bînim. Toni Morrison di 1931-ê de li bajarê Lorainê (li eyaleta "Ohio"yê) ji dê û bavekî reşik tê dinyayê. Bapîrên wan ji Afrîkayê mîna koleyan ber bi Amerîkayê hatin ajotin. Wê bi malbata xwe re hemû astengiyên ji ber Afroamerîkaniyê dihatin, jiya. Mîna Afroamerîkanekê tu carî bêhêvî nebû û dîroka Afroamerîkaniyan, nemaze jiyana jinên reşik di nava rûpelên dîrokê yên di tariyê de mane, bi nivîsên xwe, bi berhemên xwe radixe ber çavan. Navê wê yê esil, Chole Anthony Wofford e. Piştî zewacê, paşnavê mêrê xwe (Morrison) distîne û di warê nivîskariyê de, navê Toni Morrison bi kar tîne. Di sala 1988-an Xelata Pulitzer werdigre. Morrison nuha li Unîversîteya Princetonê mîna profesorê edebiyatê kar dike.

Heta nuha 6 romanên wê hatine çapkirin: Çavên Herî Şîn (1970), Sula (1973), Strana Solomon (1977), Bûka reş î qîr (1981), Beloved (1987) û romana Caz, navê orîjînal "Jazz" (1992). Hemû romanên wê li ser jiyana reşikan, derd û kulên Afroamerîkaniyan, nemaze jinên Afroamerîkaniyan hatine avakirin. Ji dervayî "Strana Solomon", qehramanê romanên wê yên din jin in. Pirtûkên Morrison li gel hêjayiyên xwe yên edebî, ji aliyê pêvajoya nîjadperestiya li dij Afroamerîkaniyan ve, li ser rûpelên tarî yên dîrokê şewqeke xurt e.

Bi hêviya ku ev xelata dengê mirovên reşik, dê di têkoşîna li dij nîjadperestiyê de bibe qonaxeke nû... □

Kultur û Polîtîka

Riza Polat

"Hêza Çakûç" û Şermoktiya Rewşenbîrên Kurdan

Hinek tişt hene ku mirov gelek caran bîne ziman jî, ji pêwîstîya xwe tiştekî kêm nakin. Yek ji wan awayê fikirandina rewşenbîrên Kurdan e. Fikrandina rewşenbîrên Kurdan xwe ji bin sîbera rewşenbîrên Tirk, Ereb û Farisan xelas nake. Bi taybetî ev nuxte di helwêstên siyasî de pir diyar e.

Rewşenbîrên Kurdan di jiyana sîyasî de xwe ji zahmetiya afirandina siyaseta ji bo xwe xelas nabûne. Piranîya caran di çêkirina merkeza polîtîkayan de menfeetên gelê Kurd nayên ziman. Di esasê xwe de ev jî ji psîkolojiya jixweşikbûnê û bi xwe nebawerbûnê tê. Sebebeke bingehîn psîkolojîyê jî ew bû ku tevgera çep a Tirk, Ereb û Farisan tevayîya serhildanên Kurdan bi paşverûtî û bi nokertî û xulamtîya emperyalîzmê îtham dikirin. Belkî ev bû sebebeke muhîm ku gelek kadroyên Kurdan ji bona xwe ji van îthaman bişon û xelas kin, di partîyên komunîst an jî yên çepên van welatan de cih girtin. Vê yekê jî têr nekir, di salên 1970'yan de piraniya tevgerên Kurd ji bona ku ji bin van îthaman xelas bin xwe sosyalîst îlan kirin.

Lê vê helwestên Kurdan, cardin jî tevgera Kurd ji van îthaman xelas nekir. Li Îranê sekreterê TUDEH ê kevn "Ayetullah" Nûreddîn Kiyanûrî tevgera gelê Kurd a Îranê bi hevalbendî û nokertîya Emperyalîzmê îtham kir. Her weha qewmîyekî Ereba yê xurt û Sekreterê Partîya Komunîst a Lubnanê George Hawî di 1984'an de xebateke "ilmî û teorîk" weşand û di wê xebata xwe de tevgera Kurdên Iraqê bi paşverûtî û di xizmeta emperyalîzmê de dît. Hawî bi dînarên Seddamê xwînxar li Lubnanê "têkoşîna sosyalîzmê" dida.

Kesên ku îro tevgera gelê Kurd bi paşverûtî û bi imperyalîzmê ve girê didin, ji kesên dihu li paytextên welatên sosyalîst rûniştibûn û teorîyên bi fantazî diafirandin û tevgera gelê Kurd bi çavekî xerab didîtin jî, xetertir in.

Lê çi mixabin hinek rewşenbîrên Kurdan û hêzên siyasî ji bo pûçkirina van îthamên bêbingeh helwesteke şermokî nîşan didin. Wek mîsal, rewşenbîrên Kurdan eve serê sê salan e ku hê jî pirsa Hêza Çakûç bi şermokî û mahcûbî munaqeşe dikin. Wek gelek pirsan di vê pirsê de jî tevgera çep a Tirkan bihn û nefesa Kurdan çikandiye. Di esasê xwe de pêwendîya helwestên çepê Tirk a dijî Hêza Çakûç û antî emperyalîstîyê tuneye. Ew di bin çîroka şerê dijî emperyalîzmê de, dixwazin rê li pêşîya qonaxa têkoşîn û qetandina zincîrên koletîyê ya gelê Kurd bigrin. Bi gotina Dogu Perînçek "Balkanîbûyina Tirkîyê" tirs xistîye dilê wî û ketîye nav panîkê. Ji ber wê jî ji bo ku hukumeta Kurdan a Federe bifetisîne, zûde ketîye rêyan, bajar bi bajar mitingan çêdike û beyanan belav dike. Perînçek navê vî karê xwe yê qirêj jî kirîye "Xelaskirina gelê Kurd ji bela Emperyalîzm û Rojavayê". Perînçek dibêje; "wek tê gotin Hêza Çakûç Kurdan naparêze. Kurdistan wek binkeyeke Amerîka tê avakirin. Amerîka û Hêza Çakûç bêyî qirkirina Kurdan di şerekî bê dawî de tiştekî din waad nakin". (Cumhuriyet, 17.12.1992)

Dogu Perînçek û rojnama Aydinlik dihu tevgera Kurd wek dûvika Sovyetê didît û îro jî wek dûvika Amerîkayê dibîne. Lê dîyar e derdê van kesan ne Sovyeta dihû bû û ne jî Amerîkaya îro ye. Derdê wan bi tevgera Kurd re ye. Ew dixwazin rê li pêşîya Kurdistaneke azad bigrin, ew baş dizanin ku faktora pêşketina şexsîyetek û kulturek millî ancax bi dewletbûyinê dibe. Şexsîyeteke Kurdî, şiûreke millî ancax bi dezgeyên civakî û siyasî kûr dibin û bi pêş dikevin. Baş diyar e ku muhaweleya wan ew e ku Kurda bikin Anadolîyî.

Mixabin DEP û hinek Kurdên din bêyî ku menfeetên millî bifikirin mil didin Seddam, Ecevît û Turkeş. Îro herkes baş dizane ku Amerîka an jî NATO ji bo di mintiqê de plan û projeyên xwe bi cih bîne ne muhtacî hêzeke sembolîk a wek Hêza Çakûç a ku bi 43 firoke û 1640 esker û efseran pêk hatîye.

Xeyalên Perînçek ên berî 12'ê Îlonê êdî li Tirkîyê bi cih tên. Berî 12'ê îlonê wî dixwest bi Turkeş û Erbakan re li dijî tehdîda Sovyetê koalîsyoneke millî çêbike. Lê îro jî ji ber xeterîya tevgera Kurd bi Turkeş, Erbakan û Ecevît re mutabaqateke millî diparêze.

Nuxta ku mirov pê diêşe û aciz dibe ne ew e ku paşverû, pêşverû û çepên Tirkan di pirsa rizgarbûna bihostek erdê Kudistanê de ketina panîkê û bi hev re dixwazin rê li ber bigrin.

Lê ya ku mirov pê diêşe ew e ku helwesta hin rewşenbîr û hêzên Kurdan ev serê sê salan e berê HEP'ê îro jî DEP her tim li dij mayîna Hêza Çakûç disekinin. Di meclîsa Tirkîyê de di dawîya meha 12 a 1993'an de ji bo "Hêza Çakûç" dengdan çê bû, careke din jî DEP'ê bêyî ku bifikire daxwaz û menfeetên gelê Kurd çi ye, siyaseteke şaş û xelet meşand. Salek berî niha li Tirkîyê Turkish Daily News ji bo ku helwest û fikra gelê Kurd û Tirk di derheqa Hêza Çakûç de bipîve anketek çêkir. Di vê anketê de Tirkan digotin bila Hêza Çakûç derkeve, lê ji %70'ê Kurdan digotin bila ev hêz bimîne. Vê anketê jî da xuyakirinê ku piranîya Kurdan biserketin û destkeftinên Kurdistana başûr re ne.

Lê mixabin DEP û hinek Kurdên din bêyî ku menfeetên millî bifikirin mil didin Seddam, Ecevît û Turkeş. Îro herkes baş dizane ku Amerîka an jî NATO ji bo di mintiqê de plan û projeyên xwe bi cih bîne ne muhtacî hêzeke sembolîk a wek "Hêza Çakûç"e ya ku ji 43 firoke û 1640 esker û efseran pêk hatîye. □

BEROŞ

Mahmûd Lewendî

Jiyan şorba nîska ye

Kela min rabûye, hewes û îlham hatiye, tam wexta nivîsandinê ye. Ma şalê zirre-zirra telefonê an jî pite-pita jinikê dilopan nekin daku hewesa min nereve! Hewes û îlhama nivîsandinê wek lottoyê ye, carna 48 kron ji mirovî re derdikeve, carna jî du milyon. Îcar înşellah a min ya du milyonî be.

Belê, ez dixwazim pêşî ji we re piçekî qala planên xwe yên nivîsandinê bikim. Plan û programa min a nivîsandinê bi qasî ya Wezareta Kulturî û ya Perwerdekarî ya dewletekê ye. Ezê ferhengekê derxim, pişt re ezê ferhenga hemû lehceyan derxim. Paşê ezê antolojîya nivîskar û helbestvanên Kurdan derxim. Paşê ezê yeko yeko li ser jiyana wan binivîsim û peyderpey wek kitêb derxim. Piştre ez difikirim li ser malbatên Kurdên navdar binivîsim. Û min dest bi hemûyan jî kirîye. Hema hema bibêje min ji hemûyan hinek nivîsandine. Lê tu yek ji wan hê temam nebûye.

Do êvarê jî min dest bi nivîsandina jiyana Qedrî Can kir. Nêta min heye ez li ser jiyan û berhemên wî kitêbekê derxim. Lê min ew jî nîvco hîşt. Ji xwe va ye ev nivîsa ku nuha ez ji we re dinivîsim ket navbêrê. Lê bawerîya we hebe her çiqasî ez vê nivîsê dinivîsim jî, di heşê min de gelek tiştên din yên nû jî derbas dibin. Di 1983'an de min dest bi nivîsandina romanekê kiribû, nuha ew hat bîra min. Mumkun e ez dîsa dest bi wê bikim. Lê na welle pêşî divê ku ez kurteçîroka xwe xelas kim. Min kurteçîrokek pir xweş nivîsandiye. Navê wê jî "Manga Bi Ga" ye. Baş e, lê kovar? Ma ne min kovarek jî amade kirîye. Na lo kovar zehmet e. Perê min tuneye. Ji ku ezê hê rabim mehê carekê kovarekê amade bikim, bi perê xwe çap kim, dîsa bi perê xwe ji we xwendevanan re bişînim û hûnê jî ji min re nameyeke sipasîyê bişînin. Û ezê jî rabim bi ser de dîsa bi perê xwe nameyeke sipasîya sipasnameya we binivîsim û bişînim. Ûff ez aciz bûm.

Dîsa pite-pita jinikê! "Mahmûûûd, kanê me yê îro cil buşuşta!?" Bavê Nazê wexta diqeherî digot "Ezê kirasê xwe biçirînim!" De were neçirîne! Tam îlhama nivîsandinê hatîye, jinikê pêde pitpitand! Şuştina cilan ji ku derket? Li vî welatê gawiran jî cilşuştin bi serê xwe derdekî giran e. Hê emê rabin cilên xwe yên qirêjî berevkin, paşê li gor yên bi reng û yên sipî ji hev derxin. Dermanê şuştinê û yê nermkirinê bigrin herin cilşoyê bavêjin makîna cilşuştinê, piştî saetekê derxin, di makîna quvaştinê de biguvêşin, paşê bavêjin makîna zuhakirinê, paşê derxin qat kin, dûz kin û bînin mal. Îcar li malê jî dîsa ji hev derxin, li gor cilan wan di dolaban de bi cih bikin. De xwedê hebînî yanê ne ez bim kî kane vî derdî bikşîne?

Xwezka li gel kompitura xwe ez ji xwe re di heyamê însanên şikevtan de bijîyama. Qe nebe di heyamê wan de derdê cilşuştina wek îro tunebû.

"Mahmûûûd de hadê!"

Xwendevanino, wekî hun jî dibînin nahêlin em binivîsin. De bila vê carê jî wekî her carî nivîsa min nivco bimîne.

Çend pêkenîn ji Rêber Seîd

(Rêber xortekî 17 salî ye, li Qamişlîyê dimîne.)

Ma ez wekî te dîn im

Carekê tirimpêlek qulupî, du kes têde bûn. Destê herduwan şikest. Rabûn çûn cem hekîmekî. Hekîm destê yê pêşî dceriband û dipêça dibû qarqara wî.

Ê didiwa destê xwe da hekîm. Hekîm destê wî jî girêda bêyî ku deng jê derkeve. Hevalê wî jê pirsî:

-Ma çawa dibe hekîm destê te çêkir û te deng dernexist ma qey neêşîya?

Hevalê wî got:

-Ma ez wekî te ker im ku destê xwe yê şikestî bidimê, min destê xwe yê sax dayê!

Televîzyoneka şîn

Yek çû cem televîzyonfiroşekî, gotê:
-Ma televîzyonên we yên rengîn hene?
-Belê hene.
-Ê de ka yeka şîn bide bin!

Mêş ket çavê min

Carekê sipîyek û pêşûyek (kermêş) xwestin bazdin ka kî xurt e. Herduwa bazdan. Sipîyê zora pêşûyê bir. Diya pêşûyê jê pirsî:

-Qey te nikarîbû zora sipîyê bibira, sipî hê ne weke teşkekî te ye!

Pêşû:

-Yadê minê zora wî bibira lê bi rê de mêşek kete çavê min!

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

◆Li dinê tunela yekem di sala 1863'an de li Londonê hatiye kolan. Dirêjahiya vê tunelê 6,4 km bû û bi lokomotîfa bûxarê mirov tê re dihat û diçû.

◆Lêkolîner bi alîkariya xetên di dara kevnare ku bûye fosîl û darên heyî de dikarin emrê daran heya 18000 salî jî tesbît bikin.

◆Ji firokeyên leşkerî ku di dema Şerê Cîhanê yê Yekem de hatin bi kar anînê, firokeya Moskîto (Mosquito) baştirîn bû û îskeleta vê firokeyê ji darê hatibû çêkirin.

◆Pîveka saleke ronahiyê cara yekemîn di sala 1888'an de hat bikaranînê. Di sala 1983'an de wek 9 460 528 405 000 km. hat qebûlkirinê.

◆Bebeka leyistokê ku dikare bibêje "bavo" û "dayê" di sala 1880'ê de bi xebata Thomas A Edîson hat çêkirin.

◆Vîtamînên ku îro em pê dizanin di sala 1990'an dema kîmyazan C. Fuuk vîtamîna B1 îzole kir hatin naskirin. Gotina vîtamîn di mana "ji bo jiyanê maddeyek pirr girîng" de ye.

◆Gelek ji we fitbola Amerîkî temeşe kiriye û wek bala we jî kişandiye ku fitbola Amerîkî pir sirt e. Di sala 1905'an de 19 kes ji ber birînên xwe mirin.

◆Di zimanê Eskîmoyî de 63 formên lêkerên dema nûha û 252 şiklên tewandina navan hene.

◆Li Nîjeryayê ji her bîst (20) zayînê 1 cêwî ye. Ji ber wê yekê li dinê piraniya cêwîya li Nijeryayê ne.